

Ad hat û derbas bû.
 Wetaya îdê ji bo kurdên koçber ci ye?
 Beriya îdê zarokên malbatêñ koçber ji dê û bavêñ xwe ci dixwazin? Ev coşa îdê ya li welatê wan li. welatê xerîbiyê jî hebû? Wê roja serê sibeha îdê, çend kesan li deriyê wan bixista? Tasika şekirê îdê wê vala bibûya an wekî xwe bimaya? Ew derfet hebûn ku kincêñ pak û paqij roja îdê li xwe bikin? Wê, li vê xerîbiyê roja îdê hesreta welêt, ji bo demeke kurt be jî vemire? Gelo îd li welatê wan xweş bû.
 an li welatê xerîbiyê. Em li bersiva van pirsan geriyan. Malbatêñ koçber ên kurd ku li Stenbolê dijîn tevî hemû tengasiyan jî, em hewandin û pirsên me bersivandin.

R. 3

**Dengbêj Rêber:**

Em hewcedarî
kademyeke kurdi ne.

R. 8-9

J.Bet-Şawoce:

“Teza kurd ya dîrokî
xwedî gelek xeletiyan e”


R. 45

Amed Tigrîs:

İdeolojî ne kinc e
ku mirov biguherîne

R. 7

Cejna Remezanê pîroz be!



SAMİ TAN

Di rastiya xwe de her tişt
eskere ye, rayedarên
dewletê li hemberî gerîla
ketin tengasiyê berê xwe
dan gelê sivil bi vê yekê ji
tiştek bi dest nexistin, îcar
xwestin serokê tevgerê ji
holê rakin.

Gotinên pêşîyan carinan dîtin û ramanên mirov bi kurtebirî tînin zimên, min divê vê hefteyê, bi alîkariya çend gotinên pêşîyan bûyera Susurlukê û Rapora Kutlu Savaş şirove bikim.

Rapora Lijneya Lîkolînê ya Serokwezîrê tîrk hate daxuyandin. Bi vê yekê re derket holê ku Serokwezîrê Tîrkiyeyê Mesut Yilmaz, *bi guran re dikuje, bi xwedî re şînê dike*, angô ew li aliye kî raya gişî bi gotinên tûj dixapîne, li aliye din jî dide xwe ku sûcên dewletê bincil bike.

Mesut Yilmazê ku digot: "Ezî di 15 rojan de her tişti derxim holê", pişî ku bû serokwezîr, endamên çeteyan yeko yeko hatin berdan, îcar got: "Heke çi ji min bê ez nekim, bila serokwezîrî li min heram be", niha jî dibêjê: "Sirêñ dewletê hene, em nikarin her tişti bibêjîn." Lî ji bîr dike ku çiqas av di golan de bimîne, wê genî bibe.

Li gorî rapora nûhatû pişî sâla

1993'yan, angô pişî ku Tansu Çiller hatiye ser kar, kesen ku li dijî tevgera azadîxwaz şer kirine, pişî demekê ji bo berjewendiyêne xwe xebitîne. Di vir de tiştek balê dikişîne, kesen ku rapor amade kirine, lê xebitîne ku kirêtiyêne berî 1993'yan veşîrin. Lî em baş dizanîn ku, xeta xwar ji gayê pîr e, lewre ji kes nikare, berpirsiya Evren, Özal, Demirel û İnönü bi me bide jibîrkirin.

Niha siyasetmedarên tîrk ên dewlet-perest, kuştina karsazên kurd wekî sira dewletê bi nav dikin û rastiya wê vedişîrin, lê divê neyê jibîrkirin ku *giha di bin keviran de namîne*, kujerên devbixwîn, dê yeko yeko hesab bidin.

Vê raporê jî hêviya gel di avê de bir. Di rastiya xwe de her tişt eskere ye, rayedarên dewletê li hemberî gerîla ketin tengasiyê, berê xwe dan gelê sivil angô, *nikaribûn bi yêñ berdayî, cûn ên girêdayî*, bi vê yekê ji tiştek bi dest nexistin, îcar xwestin meseleyê ji binî ve "çareser" bikin, yanê serokê tevgerê ji

holê rakin. Rayedarên tîrk 50 milyar dolar li vê operasyonê xerc kirine. Li vir durûtiya wan derdikevê, holê. Lewre ew dibêjîn: "Rizgarbûna gelê herêmê di GAP'ê de ye", lê heta niha bi tenê 12 milyar dolar li vê projeyê xerc kirine. Her wiha, ji bo ku proje biçe serî pêwîstî bi 20 milyar dolarên din heye, lê wan heta niha 80 milyar dolar li operasyonê leşkerî xerc kirine.

Her wekî Serokê Gişî vê PKK'ê Abdullah Öcalan ji da xuyakirin, hin kes dixwazin, bi kuştina wî bibin "çehremân". Lî xuya ye ku bi vî awayî di nava sûc û kirêtiyê de diçin. Riya qehremaniyê diyar e, yê qehremân ew e ku hesin sor bû, rahêlê. Niha kîşeya kurd hesinê sor e, yê ceger bike, dest biavêye vê kîşeyê, dê nav û dengê xwe li rûyê cîhanê mayînde bike. Heke wisa nekin cê ev gotina bi rengê berî baranê ba, *berî mirînê ta ye dawiya wan xweş rave bike*.

Bê azadî cejn nayê pîrozkirin

Ferhengok

bangawazi: bang
bîşîrîn: besmîn
(tebessum)
câpîzî: matbaa
cîzîkirî: çewsandan
kevneşop: tore
(gelenek)
dadger: hakim
dadmendi: hiqûq
darezgeç: yangı
den: maşel (asma)
dérandin: xêrmankirin
derfet: imkan
dîndîne: hov, wehs
diyarde: fenomen (olgu)
dozger: savci
erdîhê: zelzele
edî: peyvir, fonksiyon
ezmûn: tecrübe
ezmîngîh: laboratûwar
fetonek: vîraj
gesî: ger, seyehat
gewîne: mezin
gewîşî: taybetmîndî,
herîkhar: rawan (akıcı)
hêrdîvî: pelîş, rûxayı
hîncet: mazeret
hîgmendi: zanebûn, şûr
jî nedî ve: ji nişka ve
(birden)
kat: dem, wext
kesesî: keseyatî, şexsiyet
kurtîkîj: kurtîkîj
kurkurîc: çâş
lawî: sewal, ajal

lem: tûre (sebze ve
meyve fidanı)
ligeç: digel, teví, pê re
mayînde: timî
natorvan: nobedar,
nefîkirin: sirgûnkin
mûjen: hemdem
pereng: arî, pol (köz)
pêhîfî: rûdan, qewimîn
pîşafît: asfîmalasîn
pîle: rade, derece
ponîjî: kûr fikirîn
qad: gorepan, meydân
râmangîfî: aqîlmendi,
rasyonalizm
raz: sir
reasen: xwerû, ojînai
rewa: meşru
rébûwar: rê û rîçik
rojêran: gerestêr (gezen)
seqakîrin: sütin (bilemek)
serbîrî: serpêhâtî, xatira
seyidvan: nêçîrvan
sabâş: baxşış
sanîstant: medeniyet
sehâl: sol, pêlav
şîl: tişte ku pê tifingê
dadigirin
tejîk: cureyekî merşîk û
xalîce
tejîk: çelik
teqez: misoger, mitleq

M. ZEKİ ETİZ

Dema ku peyva 'cejn' tê gotin, bêguman azadî, kîfxweşî, aşti û biratî tê bîra mirov. Her kes di vê rojê de, dixwaze bi şahiyeke mezin di nav zarok û xizmê xwe de pîrozbahîyeke bi govend û dilges, di bin ala azadiyê de li ser welatekî azad û serbixwe derbas bike. Di vir de tê dîtin ku bêazadî ne gengaz e ku cejn bên pîrozkirin. Lewre di nav her civakê de pişî serkeftin û azadiyê cejn çêbûne û hatine pîrozkirin. Cejnên musilmanan ji, pişî pêvajoyeke, wisa derketine holê. Baş tê zanîn ku Hz. Muhamed heya civakeke serbixwe û azad ava nekiribû, tu cejn pîroz nedikir. Lewre Hz. Muhamed yekîtiya cejn û azadiyê baş dizanibû.

Çawa ku di nava ola İslâmî de cejn pişî serkeftin û azadiyê hatîne pîrozkirin, di nav van gelê din de jî, tevahîya cejnan pişî serkeftin û rîzgariyê derketine. Ev rojîn ku dibin cejn, bi sedsalan heta bi hezar salan her dem, her sal jî, ji hêla wan civakan ve têñ pîrozkirin. Her kes dixwaze wê rojê bi kîf û şahiye de nav zarok û mirov xwe de, bi dilê xwe derbas bike.

Niha mîna hemû gelên mülman êm gelê Kurdistanê jî, cejnekê pîroz dikin. Lî belê, gelo çend malbatên kurdan dikarin vê rojê bê tirs, bêlêdan, bêzordarî, bêbirçîbûn, li ser welatê xwe li gundê xwe pîroz bikin? Ka çend mirovên kurd dikarin di nav zarok û zêçen xwe de bêkuştin, bêgirtin,

bêşîn û girîn vê cejnê derbas bikin? Ka çend malbatên kurdan di vê rojê de, ji bo zarokên xwe kîncen rind û xwarineke xweş dikarin bikirin?

Belê bi kurtahî em dikarin di bersîva van pîrsan de wiha bibêjîn; gelê kurd tu cejnên xwe bi rewşekê serfiraz û dilşad, bi rûyekî ges nikare pîroz bike. Lewre gelê kurd ev çend sedsal in her dem di bin zordariya qirkirin, tâlankirin û koçberiyê de jiyana xwe derbas dike. Nemaze di van salên dâwî de her roj ji aliye dewleta dagirker

"**Ser, cejna gelê bindest e.**" Lewre bêşer ne gengaz e gelê bindest bigihêje azadî û serxwêbûnê. Ji ber vê yekê cejna me yî herî mezin geşkirina şerî azadiyê ye, firehkîrina qada cengê ye.

ve çiya û gundên kurdan têne bombe-kirin. Bi hezaran gund hatine şewitan-din, bi milyonan kurd ji welatê xwe hatine koçberkirin, li welatên biyaniyan hatine belavkirin. Di rewşekê birçi, tazî û belengaz de dijin. Her roj bi sedan xort û keçen kurdan di bin dezgehê lêdan û tadeyê de têne derbaskirin. Bi dehan di bin cavan de têne windakirin. Çavêñ dayîn kurdan tu carî ji hêstiran ziwa nabin. Bi vî rengî jiyanê neşweş, dilsot didin meşandin. Neyarêñ xwînxwar nehiştine ku gelê kurd tu carî cejna xwe bi şahiyeke dilxweş, bi rûyekî li ken derbas bikin.

Ji pîrozkirina cejn û seyranan hatine dûrxistin.

Belê, ka çawa iro gelê cîhanê yî azad rojîn xwe yêñ cejn û şahîyan bi kîfxweşî bi dîlan û bi geştan pîroz di-kin, pêwîst e ku em jî ji bo cejna xwe, xwe amade bikin. Em bi kîncen keskisor û zer bejna xwe bixemîlinin, bi stranî şoreşgerî dengê xwe bilind bi-kin, bi govend û dîlan destê hev bi-girin û herin şer. Lewre cejna me ceng e. Çawa ku serok dide xuyakirin: "Şer, cejna gelê bindest e." Lewre bêşer ne

gengaz e gelê bindest bigihêje azadî û serxwêbûnê. Ji ber vê yekê cejna me yî herî mezin geşkirina şerî azadiyê ye, pêşveçûna têkoşîna rîzgariyê ye, firehkîrina qa-da cengê ye.

Em gelê kurd tenê bi şerîkî dijwar dikarin serkeftinâna xwe bi dest bixin. Jixwe her serkeftinek ji me re cejnek e. Pişî serkeftina mezin gengaz dibe ku em bikarîn cejnên xwe bi şerîkî azad pîroz bikin. Kesen kole û bindest nikarin tu cejna pîroz bikin. Lewre di nav wan de ne kîf heye, ne dilşadî û ji wan re tu mercen pîrozkirinê tune ne. Tenê bi dayîna şerîkî dijwar û bi destxistina serxwêbûnê re ew dikarin cejna pîroz bikin. Ji ber vî qâsi iro gelê kurd di nav vî serî mezin de ji ber ku her roj serkeftinâna bi dest dixe, jî re her roj cejnek e. Em dikarin bi vî rengî cejnên xwe yêñ bi rûmet; hem yêñ olî, hem jî yêñ neteweyî bi dilşadî û govendan pîroz bikin.

îda gund başqe ye, ya xerîbiyê başqe ye

İd hat û derbas bû. Wetaya îdê ji bo kurdên koçber ci ye? Beriya îdê zarokên malbatên koçber ji dê û bavêne xwe ci dixwazin? Ev cosa îdê ya li welatê wan li welatê xerîbiye ji hebû? Wê roja serê sibeha îdê çend kesan li deriyê wan bixista? Tasika şekirê îdê wê vala bibûya an wekî xwe bimaya? Ew derfet hebûn ku kincen pak û paqij roja îdê li xwe bikin? Wê, li vê xerîbiyê roja îdê hesreta welêt, ji bo dermeke kurt be ji vemire? Gelo id li welatê wan xweş bû an li welatê xerîbiyê. Em li bersiva van pirsan geriyan. Malbatê koçber ên kurd ku li Stenbolê dijîn tevî hemû tengasiyan jî, em hewandin û pirsên me bersivandin.

Dewletê mîrê min kuşt

Ayşe Özkan (50) diya sê zarokan e. Ji sê zarokên wê yek niha li nexweşxaneyê ye. Zilamê wê jî ji ber nexweşiyekê jiyana xwe winda kiriye. Ev çar sal in ku wan ji gundê xwe koç kiriye û hatine Stenbolê. Ew ji Dêrawa Sêrtê ne. Di sala 1994'an gundê wan ji aliye dewletê ve hatiye şewitandin. Milê dayika Eyso wê demê, ji aliye leşkeran ve tê şikenandin. Pişa mîrê wê disikîn. Ew pişti vê bûyêre derbaşî Sêrtê dibe. Li Sêrtê jî du rojan li mala cîranê xwe radikeve, pişti wê tê Stenbolê. Dayika Eyso jiyana xwe ya Stenbolê jî ji me re bi dileki şikestî û hestiyar wiha vego: "Pismamî min hene lê yekî derî li me venekir. Yeko yeko ez diçim min digot, giđino hikûmetê ez şewitandin, hikûmetê mîrê min kuşt, sebiyê min li van erda ma, ez ketime bin destê dijmin, hema yardımîki bidin min. Wellah tu kes li min nebû xweyi (li vê derê hêstir ji çavêne wê dibarin)" Tu hazırlıya wê ya ji bo idê jî nîn bû. Zarokên wê pêxwas bûn. Ew vê yekê bi hevokerê şrove dike: "Wê Xwedê bîqedîne." Berê dayika Eyso serê sibeha idê girarek çedikir, li ber jî goşte bizinê yê nû, şekirê idê dikir, lê vêga ew nikare van tiştan bistîne, lewre ew derfetên wê nîn in. Dayika Eyso wekî dawî hêviyêne xwe ji wiha gotin: "Ew roj nêz in ku em ida xwe li gor dilê xwe li ser erdê xwe piroz bîkin."

Em ne zanîn id e...

Rahîme Taş (65) ev çar sal in ku ji gundê xwe, bi malbatî hatine Stenbolê. Gundê wan ji di sala 1994'an de ji aliye dewletê

ve hatiye şewitandin. Ew li Stenbolê di malekê de 11 kes dijîn. Di malê de kesek kar dike, mehê 30 milyon dikeve destê wan. Dayika Rahîme, "Hema bila em li welatê xwe bûna bavo bila ew jî nîn bûna" dibêje. Piş re jî dibêje: "Welleh em ne zanîn eyd e, ne zanîn xêr e ne jî zanîn dawet e." Dema ku li gund bûye, di idê de li hemû malen gund geriyaye. Lî ew diyar dike ku li Stenbolê, ew nikarin ji mala xwe jî derkevin. Her wiha dayika Rahîme wê difikire, ka wê bikaribe, du parî goşt deyne ser agir, adet û toreyâ xwe bikaribe bi cih bîne. Ew vê yekê bi dayina Xwedê ve girê dide û dibêje: "Heger Xwedê bide emê çêkin, lê ku neda em ci bikin."

Dayika Rahîme gotina xwe wiha didomîne: "Tu bêjî ciqas nîmeten dinayê, hemû di memleketê me de hebû. Her tişte me jî hebû. Li vê derê kurê min û keça min her heste 5 milyonî tînin. Ku heta meh biqedê wê ci pê bê. Emê ci bixwin, ci li xwe kin." Li ser pirozbahiyê li gund jî dayika Rahîme vê dibêje: "Li gund bi pêşengiye melê re, serê sibehê me çenteyê xwe tiji fêkî, nan şekir dikir û me didane feqîr û gavanen xwe. Pişti wê ida mela û mixtarê gund dihate pirozkirin. Lî li vê derê misilmanek nîn e ku bêje ida we piroz be." Çend xwarziyên dayika Rahîme di girtigehê de ne. Ew diyar dike ku ci bîkeve ser pişa wan ewê xwe jê nedine alî û "Canê me ji bo kurda feda be.", dibêje.

Em mahcir in li ser motoran e

Fadile Biyan (60) çar salan berî niha pişti ku gundê wê bi navê Dêrewa ku bi ser Sêrtê ve ye, ji aliye leşkeran ve hatiye şewitandin, tevî malbata xwê hatiye welatê xerîbiyê. Dayika Fadile hijdeh rojan di bin çav de maye. Dema ku leşkeran bi ser mala wê de girtiye û mîrê wê bi xwe re birine, wê xwestiye ku bi mîrê xwe re bîaxive leşkerî bi qûndaxa tifingê li pişa wê xistiye, ew niha jî ji ber pişa xwe nikare tu karî bike. Li malê du kes dixebeitin; simitan difiroşin. Rojê pêncsed hezar dikeve destê wan. Dema ku me pirsa 'id çê tîne bîra we' jê pirs kir, hêstir ji çavêne wê bariyan û kelogirî got: "Em mahcir bûne, em li ser pişa motorê ne, welatê me tê bîra me." Ew ji bo idê neketine nav hazırlıyekê, lê dayika Fadile dibêje: "Zarok şekiran dixwazin em ci bikin jî divê em



kîlok şekir bikirin û deynin malê. Li memleket em ne welê bûn. Li memleket pezê me, nîşte me, dewê me, mastê me, tişte tunebûye hebû. Lî li vir tuneye, tişte tuneye tuneye, em dikarin ci bikin?" Dayika Fadile diyar dike ku ew ençax dikarin serê sibeha idê girarek û fasulyeyekê deynin ser êgir, ew jî heger ku qediyâ.

Hêvi di dil de gur e

Safia Esen (25) çar zarokên wê hene. Ew jî ev 7 sal in ku hatiye welatê xerîbiyê. Mîrê wê di metroyê de karê paqijiyê dike. Mehê sih milyonî distîne. Ew jî nikare vê idê bi dilê xwe, dilê zarokê xwe geş bike. Tişte ku Safia dizane "îda gund başqe ye ya Stenbolê başqe ye." Ji her halê wê diyar e ku hêviya agirê welatê azad di dilê wê de bi hatina idê hê gurtir dibû. Lewma xwarina gezik nanê tisi yê zaroka wê ya biçük ji bo wê dibû barekî giran.

Zarok bêriya bavê xwe dîkin

Mesude Algül (40) ji gundê Titinê ku girêdayî Sêrtê ye. Di sala 1994'an de zilamê wê li gund ji aliye dewletê ve tê kuştin. Ew pêşî demek kurt li Sêrtê dimîn, piş re jî koç Stenbolê dîkin. Mesude diya çar zarokan e. Ji çar zarokan yek niha li ameliyatîkirî li nexweşxaneyê ye. Ji ber nebûna derfetan nexweşiyê ve li hemû canê lawîkê wê pêça ye. Ew niha nikare pêdiviyen malê û daxwazên zarokan bi cih bîne. Mala dayika Mesude de hêwî (nem) ye, germahiya sobeyê hundir germake, ji ber hêwîbûna di hundir de mersîkên wê şil bûne.

Derdorênen welatparêz, kes û sazî car caran alîkariya wê dîkin, lê ew jî dibêje: "Ma wê hetanî kengê wiha bidome?" Qeder hê şes salî ye, bêriya bavê xwe kiriye, ji diya xwe re car caran "Yadê bavê min li gund e, em herin wî bibînin, min gelekî beriya wî kiriye", dibêje. Qederê bavê xwe bi tenê di wêneyan de nas kiriye. Diya wê dilê xwe ji me re wiha vedike: "Her zarok dixwaze ku idê bavê wê/jê re kincen nû bikire, şekir bîne malê. Mixabin her bav nîn e, li vî welatê xerib ez jî nikarim bi ya dilê wan bikim." Di idan de bêhtir Newroz û çalakî bi bîra Mesude Algül dikevin.

AZAD ALTUN

Kurtenûçe

Nîvîskar Doç. Dr. Haluk Gerger roja 26'ê rébendanê ji ber nîviseke ku di rojnameya Özgür Gündemê de nîvîsibû, kete girtigehê. Gerger got: "Cezayê ku li min hatine birin, encameke şerê qirêj e." Her wiha Gerger diyar kir ku ew dê dîsa têkoşina xwe bidomîne. Ji ber girtina Gerger reaksiyonen tûj hatin nîşandayin. Serokê İHD'ye Akin Birdal girtina Gerger şermezár kir û got ku ev cezakirin ne destpêk e, ne jî davî ye. HADEP û Înstituya Kurdi ya Stenbolê ev êris protesto kirin.

Orkestraya Akademîya Kurdi li bajarê Neusa Almanyayê hate damezirandin. Di rojén derbasbûyi de li salona semînerê ya akademîye civînek li dar ket. Nêzîki 30 hunermendênu ku gelek cureyên amûren muzîk lê didin, beşdarî vê civînê bûn. Di civînê de pirsgirêkên muzîka kurdi yên iroyîn, hatin nîqaşkirin. Pişti civînê, komîteyeke amadehî û rîveberiya orkestrayê hate hilbijartın. Ji başûrê Kurdistanê Celîl Asîd ku perwerdehiya akademîk ya muzîkî dîtiye ji bo şefitiya orkestrayê hate hilbijartın. Bi vê orkestrayê xebatêna akademîye gîhist qonaxeke nû.

Serokê Giştî yê Komeleya Hıqûqzanen Hemdem Av. Aydin Erdogan ragihand ku di raporê Susurlukê de diyar dibe ku gelek rayedarên dewletê ketine nav kârên qirêjî, lê li hemberî vê yekê tu tişt nayê kirin. Erdogan xwest ku di leztirin demê de darizandin pêk bîn. Av. Erdogan ev nirxandin kir: "Divê dozgerên DGM'ê bi awayekî berfireh bûyerê hildin dest. Helwesta hikûmetê ji cidiyetê dûr e." Serokwezîrê Tirkîyeyê M. Yilmaz bi hinceta razen dewletê, rastiya gelek bûyeran vedişere. Ew jî dibe sedema reaksiyonan.

Seroka Giştî ya NÇM'ê Nuray Şen pişti gotinê Mesut Yilmaz ên bi şeweyê "Cinayet bi destê çeteyen dewletê pêk hatin", da zanîn ku ew ê dozê li dewletê veke, ji bo ku kujerên mîrê wê Mehmet Şen derkevin holê û bîn darizandin. Seroka Giştî ya NÇM'ê bi bîr xist ku wê di meha adarê de heman doz li Dadgeha Mafêni Mirovan a Ewrûpâye jî bî dîtin û ew ê li wê derê jî van gotinê Yilmaz wekî delîl pêşkîs bike. Mehmet Şen di sala 1994'an de ji hêla polisîn sivil ve hatibû kuştin. Heta niha der barê kujeran de tu tişt nehatiye kirin.



Rojnamevan û nivîskarê asûrî Jan Bet-Şawoce:

Têza kurd ya dîrokî xwedî gelek xeletiyan e

GABAR ÇIYAN

(Dûmahîka nivîsa hefteya berî ve ye.)

■ Hûn dikarin me li ser wan jenosîdan (tevkûjî) agahdar bikin?

— Rast e, gelek kes ji gelê me hatin kuştin. Ji ermenî, kurdan gelek kes hatin qetikirin. Ez jî wan bi hurmet bi bîr tînim. Rihsipiyen me bêhtir qala pişti qirkirinê 1914'an dikin. Pişti ku ez hatim derveyî welêt û hinekî bi karê lêkolînî daketim, diyar bû ku li gelek alîyan; li Iraq, Iran, Sûriye, Kafkasya û Lubnanê gelek kes hatine kuştin. Büyêrên di, wan salan de lêkolînen taybetî dixwazin.

Misyonerên amerîkî, îngilizî, fransî û rûsî ji bo ku binaxeyên xwe li wela-tên rojhîlat deynin; di destpêka 1800'î de hatin navçeyê. Cûn û hatina wan bi xurtî heta serê sala 1900'î bêrdewamî kir. Misyonerên ku nû hatin hewl dan ku me baş nas bikin. Ew ziman, adet, tore û dîroka me baş fîr bûn. Tê gîhîstîn ku di destpêkê de kesen ku dikarin wan bîhewînin asûrî, ermenî û rom in. Û ew li wir bi cih dibûn. Ji bo ku hatina xwe nîşan bidin, dest bi avakirina hinek saziyan dikirin û di ber re jî ola filehiyê belav dikirin. Hinek gavêñ erê-nî avêtin. Yanî durûbûna wan gava di serî de derketa holê, wê cihê wan li nav me çenebûya. Wekî mîsal 1840'î de li Urmiyê nîvîsîn bi sûryaniya rojhîlat çap kirin. Kovara yekemîn ya asûriyan, li wir çap bû, paşê dibistan, nexwesha-ne û dîrên ku bi mezhebîn ciyawaz ve girêdayî, ava kirin. Her ku diçû dijmi-nantî û nakokîya di navbera gelên li mintiqê de xurtir û bibertir dibû. Mîr Bedirxan di sala 1843 û 1846'an de çû bi ser asûriyan de. Gelek kes li Botan hatin kuştin. Belgeyêñ nû nîşan didin ku di dema cûn û hatina mîr de, di navbera Xerpet û Torê de gelek gundê ser-re, hatiben wêrankirin. Qirkirin, jî sala 1850'yî eta 1880'yî nesekinî. Di wan salan de Almanya dixwest cihê xwe yê di navçê û de firehtir bike. Di, salên 1891 û 1895'an de qirkirinê sultanî osmanî Eydilhemîd dest pê dike. Eydilhemîd pir şenek bû. Gelên navçeyê berdan hev. Jî şeji kurdan alayê Hemîdi ava kirin. Jî taybetî ji bo ku jenosîda 1985'an ya li Amedê vesêre, derewa "serhildanê" belav dikir. Li Amed, Rîha, Torê, Bîrûn, Wan û Colemêrgê gelek kes hatin kuştin. Li wan deveran bi hezaran asûrî hebûn. Niha Kitek jî ji wan nemaye. Li sala 1909'an de Eydilhemîd dîsa keve holê. Li der û do-

Di serîhildana Şêx Seîd de gelek asûrî û ermeniyan cihêن xwe girt. Di serîhildanê din de jî asûriyan bi kurdan re li dijî neyarêن xwe şer kir. Di destpêka şerê Barzanî de, asûrî pê re bûn. Di avakirina Komara Kurdistanê ya Mehabadê de, asûrî bi kurdan re bûn. Divê ev bêñ dîtin. Nivîsandina van pêşî wezîfeya me ye.

ra Edeneyê 30 hezar ermenî û asûrî hatin qetikirin. Gelek kesan berê xwe dan Kafkasya, Amerika û Amerîkaya Latîni. Bî salan li wir man. Hinek bi paş ve vegeriyan. Di 1910'an de Ermenîstanâ Tirkîyeyê kete bin kontrola rûsan. Ew bûbû hîviyeke mezin ji bo rizgariya ermenî û asûriyan. Di sala 1914'an de li Torê seferberî hate îlankirin û mîrên wir tev birin leşkeriya romê. Paşê em pê hesiyan ku ew tev hatine kuştin. Pişti ku torê bêmîr û parastin ma, riya qirkirinê ji tirkan re vebû. Berî jenosîda Torê, İttihat û Terakiyan wisan dan xu-

yanîkirin ku şer li hemberî ermeniyan tê kirin. Lewma ye ku li Torê ku kesî amadekariya şer nedikir. Paşê tirkan desf bi qetikirina komên bêhêz kir. Kesen dihatin kuştin mîna sîxurên hin ji welatên ewrûpî û amerîkanyan nîşan didan. Pişti avakirina Komara Tirkîyeyê jî, qirkirin nesekinî. Lî bi awayekî modern dihatin kirin, dibistanê me hatin girtin, rewşenbîrên me avêtin zîndanan an jî nefî kirin. Di salên 1920-21'ê de li Rihayê di nava çend rojan de hejmareke mezin ji sûryaniyan bi zora Kemal Paşa hatin sirgûnkirin. Gelek rew-

şenbîr bi dar ve kirin. Di 1924'an de serîhildana Nasturiyan hat perçiqandin û wehşeta artêşa tirk bi salan di hundire Iraqlî de dom kir. Gelek kesan bar kir û çûn Misir, Lubnan û Kibrisê. Rewşenbîr hatin bêdengkirin û gel hat tırsan-din. Paşê jî şaxê CHP li Tora Evdîne hatin vekirin û politikaya tirk-kirinê bi xurtî hate domandin. Dewleta tirk bi te-vahîya hêza xwe ev dever xiste bin kontrola xwe.

Di 1933'yan de li Asûristana Iraqlî, li hemberî rejîma Iraqlî asûriyan serî râkir. Roja 7'ê gelawêjê artêşa Iraqlî bi piştgiriya balaşîrên RAF ên ingilîzân çûne ser asûrî û kurdan. Wezîrî Iraqlî yê hundir û berî wê diçê Tirkîyeyê li gorî belgeyêñ di destê me de, plan li wir ji tirkan re tête gotin. Berî qirkirinê leşkeren tirkan li ser sînöf têbî bicihki-rin. Pişti qirkirinê kesen kû ji destenê wan rizgar dibin, bi destê leşkeren tirkan têbî kuştin. Navenda serhildanê Sîmîlî û Suraya ji holê radikin. Ew bûyer di dîrokê de bi 'Qirkirina Sîmîl' tê nav-

kirin.

Berî şerê cîhanê yê duyemîn, Tirkîyeyê careke din berê xwe da gelên ne misulman. Wê carê İsmet Paşa dixwest ku dawîya wan bîne. Lê balyozxaneya (konsolosluk) rûsan li Stenbolê pê hesi-ya û plan hate rawestandin. Paşê gelek kes ji asûriyan dibin navê ihtiyatê de kirin leşker. Ew kes venegeriyan malen xwe. Tev li Anatolê tî û birçî man û mirin. Di dûv wê de, xela hat. Xelk ji birçîna dimir. Ew derd ne bes bûn, di ser de jî baca 'Varlik' hate danîn. Kesen ku baca xwe nedida, ew sirgûnî Anatolê dikirin. Li navçeyê hunermendant dev jî karên xwe berdan û gelek kes bûn pe-naber. Di 1950'yî de pirsa Kore û Kibris derket holê.

Gelek kurd û asûrî hatin şandin. Lê mixabin li ser wê bûyerê tû lêkolîn ne-hatin kirin. Ez hinekî lê kûr dibim û der heqa wê bûyerê de dokumentan didime hev. Di salên 1960'î de çûna Almanya yê dibe hîviyeke mezin. Di sala 1946'an de li Torê MIT'a tırka nû hin feodalîn kurdan xwestin tirs û revê têxin nava gelî. Armanca wan ew bû ku xelk bar bike û malen wan talan bikin. Di wê demê de serokê belediya Midyatê Zî-wêr Midyat bi MIT ê re kar dikir û ro-la serekî dilist.

Kürt Milliyetçiliği ve Ulusal İnkarcılık

Hazırlayan
Jan Bet-Şawoce

Bet-Prasa ○ Bet-Froso
Nsibin

Cemil İlserê Estili, M. Alî Arıkan, H. Abdulkerim Güven ê ji MHP'ê jî aligirê wan bûn. Lî divê bête gotin ku gelek kesên kurd, mîna malbata Nehroza jî alikariya súryaniyan kirin. Dr. Rifat yek ji wan kesan bû ku divê navê wî ez bi başî bînim zimên. Wî li dijî xeraban hemû tiştên qanûnî kirin û moraleke mezin dabû súryaniyan. Di sala 1974'an de dagirkirina Kibrisê bû sedem ku li dijî súryaniyan hînek plan bêñ çekirin. MIT û kesen ku li jor hatine binavkirin, careke din bi rola xwe ya xerab rabûn. Serê navxeyî yê Lubnanê jî pir tesîr li me kir.

■ Te di pirtûka xwe ya dawî "Kürt Millîyetçiliği ve Ulusal Înkarcılık (Netewparêziya Kurdî û Înkariya Neteweyî)" de gelek rewşenbir û serokên partîyan kurdan rexne kirine. Di nav wan kesan de Cegerxwîn, Barzanî, M. E. Bozarslan, K. Burkay, M. Baksî, M. Yetkin, E. Xemgîn jî hene. Armanca we çi bû? Rewşenbir û rîexistinê kurdan asûriyan baş fêm dikan an na? Mirov dikare çi bike?

— Min gelek belge ji literatûra Mezopotamyayê berhev kirine. Beşa kurdi yek ji wan e. Ez berheman yek bi yek dixwînim.

Mixabin mîna têza dîrokî ya tirkan, ya kurdan jî xwe di wan berheman di dide der. Bi salan e ku ez li ser radiwestim. Lî heya niha ez pêrgî tu nivîskarekî kurdan nebûm ku wan berheman rexne bike. Dawî min


biryar da ku ez wan xeletiyan berhev bikim, pêşî di kovara Nsibin de biwesinim û paşê bikim pirtûkek. Min wi-san kir.

Nivîskarêñ şoven û neteweperest ên tirkan ji ber talankirinê xwe her dem bûne hedefa me û ew hatine/tên rexnekirin. Qet nayê pejirandin ku rewşenbirêñ kurdan li ser navê pêşverûtiyê, mîna wan bikin. Hinek ji rewşenbirêñ kurdan ketinê vê xeletiyê. Gava min ev şasîti dît, ez şas û metel mam. Çawa dibe ku kesen pêşverû, şoresser û demokrat dikarin wi-sa bikin. Dawî min biryar da ku ji wan re bêjim: Bes e, bisekinin...

Bi vê pirtûkê min xwest bibêjim ku; asûrî jî li navçeyê, mîna kurd û ermaniyen gelek vejetandî û kevn in. Wan gelek caran di nava şerî neteweyî yê kurdan de cihê xwe girtiye û şer kiriye. Ew danûstandineke enternasyonalistî bû. Neyarêñ asûrî û yê kurdan yek in. Asûrî bi vê yekê zannin, lê kurd xwe ji vê rastiyê dûr dixin. Di serîhildana Şêx Seid de gelek asûrî û ermeniya cihêñ xwe girt. Di serîhildanê din de jî asûriyan bi kurdan re li dijî neyarêñ xwe şer kir. Di destpêka şerî Barzanî de, asûrî pê re bûn. Di avakirina Komara Kurdistanê ya Mehabadê de, asûrî bi kurdan re bûn. Di Tudehê de, di avakirina Partiya Komunist ên Sûriye, Lubnan û Iraqê asûrî rolêñ pir mezin dabûn ser milêñ xwe. İdeologên herekata neteweyî ya Filîstînê asûrî bûn. Divê ev bêñ dîtin. Nivîsandina van pêşî wezifeya me ye.

Carinan kesen ku bîran jî bo hevalêñ xwe dikolin, bi xwe dikevinê

CELALETTİN YÖYLER



Xebatîn dijminî yê bi xwîn rijandinan, bi koçberîtiyan, li ser gelê kurd, ne bi îro tenê ye ku li seranserê Kurdistanê tê meşandin. Ew bi sedan salan e ku li ser gelê me, ji hêla tûraniyêñ bi navê Osmânî ve, bi dijwarî û barbarî û xwînxvarî hatiye meşandin.

Di demêñ Osmaniyan de, malbatêñ serhildêrên wekî Bedîr-Xaniyan, Nehriyan û bi sedan mîr û malbatêñ serhildêr û welat-parêzîn kurd hatine koçberkirin û ji welatêñ xwe hatine dûrxistin û koçberî nava Anatolî û Stenbolê bûne. Hinek ji wan serhildêrên welatparêzîn wekî malbata "Canpolatan" ku di Anatoliyê de jî, nehatine sitarkirinê, revîne derbasî Lubnanê bajarê Berûtî bûne. Ji bilî van malbatan em dibînin ku bi qasî panzdeh an bîst gundêñ ku îro li navçeya Sakaryayê, li navçeya Akyazîyê, ji eşîra kurdan şexbiziñ niştecihîn wê navçeyê ne, ew

jî dibêjin: Ev bi qasî sêsed sal in ku em jî Kurdistanê hatine koçberkirin û hatine vî welañ. Hem jî bi van kurdêñ han re hem jî, ji heman eşîrê li bajarê Konyayê û li derdorê Enqereyê û li bajarê Kirsehirê, birek deveren din ji Anatoliyê, hemû bi destêñ osmaniyan hatine koçberkirin û ji welat dûr xistin.

Her wisa bi hezaran kurdêñ Êzîdî, ji devêren cur bî cur ên welêt, bi fermanêñ Osmaniyan, bi destê kurdêñ Şâfiî hatine kuştin û welatêñ bay û kalêñ wan ji devera Wanê, Qersê, Agiriyê, Erziromê, hatine derxistin û koçberkirin û derbasî Ürsatê (Rûsya) kirine. Ev kiryarêñ hanêñ pir xirab û nemirovahî hêj di demêñ Xelîfeyen Osmaniyan de her wekî ku ew ji xelîfeyen misilman in û Xweda ditîrsin û xudanêñ mirasa İslâmî û hakîmî dînê İslâmî ne hatine kirin, lê ewêñ îro? Xuda me û mirovahî ji bêtaran bêtaran pirêze. Lewre ewêñ ku digotin em misilman in di wê demê de bi hezaran mirovîn me kuştin û dane koçberkirin. Lî ewêñ ku bi eşkereti dibêjin: "Xuda tune ye! pêxember jî çûye izzînê" ew hê pirtir tûrânî ne. Wê demê emê bêjin: "Dema osmaniyan dema lê lê bû, ev jî dema lo lo ye." Yanî dema wan hebekî hêsanî bû, lê ev dem a gurê gewr e, qîlîn xwe li hev dide û êrîşî ser her kesê ji bilî

Pêşengekî dîrokniyîsîna kurdî

Husêñ Huznî Mukriyanî (1893-1947)

Huseyn H. Mukriyanî yek ji pêşen-gên dîrokniyîsîna kurdî bû. Wî li salêñ bîstan ve bi kurdî tarixa kurdî nîvîsand; bi taybetî di salêñ 1929-1939'an de. Husêñ Kurê Ebdulletif Mukriyanî li bajarê Mehabad di 12'yê meha 9'an a 1893'yan hate dînyayê.

Ew ji zaroktiya xwe de evîndarê tarîx û tore û wergerandinê bû. Dîgel vê yekê ew di warê çapxaneya kurdî de pêşeng bû. Çapxaneya wî Kurdistan yeke-mîn çapxane bû ku li Kurdistanê di sala 1915'an de vebû. Yekemîn pirtûk li vir hate çapkirin, ew pirtûk Mem û Zîna Ehmedê Xanî bû.

Sala 1929'an digel çapxaneya xwe çû Rewanduzê û li wir di sala 1929'an de dest bi derxistina kovara "Zarê Kur-mancî" kir, 24 hejmarêñ vê kovarê hatin weşandin.

Pişt re di sala 1935'an de kovara

"Ronakî" li Hewlêrê derxist. Ev kovar jî 11 hejmar derket. Husêñ Huznî çîrok-nîvis bû jî û çîrokêñ wî bûne kevirên bingeha avahiya çîroka kurdî ya nûjen. Çîrokêñ wî ev in: "Gundê Hilweşîya-yî", "Şeranî û Tehlayî".

Berheman wî yên çapkirî:

1- Zîvirandinek bi paş ve. Heşt di sê cildan de wesîya û di salêñ 1929-30-31'ê derketin.

2- Tarîxa Mîrîn Baban, 1931

3- Tarîxa Mîrîn Soran, 1935


Divê were gotin ku Husêñ Huznî pirtûkên xwe hemû bi kurdî (zaravaya soranî) nîvîsîne û nîvîskarê navdar

Mihemedê Mela Ebdulkerîm ew pirtûk hemû wergerandin zimanê erebî.

Di 21'ê rezbera e1947'an de H. Huznî li Baxdayê çû ser dilovaniya xwe.

Çavkani: Rojnameya Xebat

AMADEKAR: JAN DOST



nijadê tûranan dike û wan dikuje, malêñ wan dişewitîne û wan koçber dike û ji xwe re bi peran jî, dikare bifiroşe, cawa ku bi sedan gelê me ji Bakur û Başûr bi aîfîkariya çasîn gewre yên xwe firotiyeñ bêşerm û fedî, li keştiyên xirxope dike û dîbin ber bi welatêñ Ewrûpê û carinan nayê hesabê wan çeteyen hevgirtiyeñ ji sixûr û nokerên welatfîroşen bênamûs, wan kurdêñ belengazêñ bêmejî dixeniqînîn û di revin têne Zaxoyê û cem çasîkêñ hevalbendêñ dijmin û hinekêñ din bi rî dixin û dîbin.

Lê tu li ya Xweda binihêre, carinan kesen ku bîran û çalikan ji bo hevalêñ xwe dikolin, ew bi xwe dikevinê. Wekî koçberkirina ji bo valakirina Kurdistanê bû dafik û çal, ji bo dijminê gelê kurd û çasîkêñ bêfedê. Bû pêşveçûn û hişyariyeke pir mezin û bi hêz ji bo doza gelê kurd û eşkerekirina çeteyen Tîrkiyeyê û hevalbendîya malbata Barzaniyan ji bo wêrankirina Kurdistanê. Dijmin û xayînen welêt, bira baş bizanibin, ew bi tevgeren xwe yên bi gemar û mebestêñ xwe yên nîjadperestî, nikarin nexseya Kurdistanê bidine guherandin, lewra ew gelê ku bi xwîna xwe ya paqij, nexseya welatê xwe karibûye bineqîşîne, ew ji bo parastina wî jî amade ye.

Gula azadiyê

Welatê şewitî, axa ziwa, gul û kulilkên hişk, ciyayê rût, newalên bêav. Jiyan dojeh, her hîl tarî, her kes bêhîv û her kes bi dilşewat. Shin û girînê didan pey hev û di nav asoyê de winda bûbûn. Berê ne wisa bû ev bihuşt. Dijminê mirovahiyê, dijminê xwezayê ev welatê îrem (bihûst) xiste rewşa çola Erebistanê.

Çi ne berhemê vî welati?

Erê ev welatê kurdan, cihê dergûşa mirovahiyê û kaniya şaristaniyê bû. Ma li pêşî ne di vir de sewal hatin kedîkirin? Ma çandina dexlê (hububat) pêşî ne li vir bû. Cihê pêşketina ziman û dewletan jî ne li ser vê qadê çêbû? Herin ji dîrokê bipirsin. Bêle tev li Mezopotamyayê pêk hatin. Ev ax bû, bûbû roj ji şaristaniyê re.

Kulilkên reng bi reng li ser vê xakê pişkivîn; sumer, akad, hûrî, qasît, babîl, ûrartû, asûr, med, ermenî, pers... Ev li vî warî shin bûn. Ev welat bi deşt û ciyayê xwe ve, bi rez û baxçeyen xwe ve, bi daristan û zozanên xwe ve tev mîna bihuşt bû. Dêliyên (asma) babilan di cihanê de meşhûr bûn. Bihuşt Adem di çargoyaşa Bilis, Xîzan, Xelat û Wanê de bû. Her du çemêne mezin; ava jiyanê Ferat û Dijle, ku dîsa di pirtûkên olan de ji wan tê behskirin, di nav rihe vî welati de diherikin û vê gulistanê bi evînê av didin. Dîsa her du riyêne bazirganiyê, riya hevrîsim (îpek) û riya baharatê di ser vê axê re derbas dibin. Parzemîna Asyayê û welatên Ewrûpayê bi hev ve girê dide.

Dîsa pêşketina ramanan û derketina olan, pêşî li ser vê axa pîroz der. Li gorî çirokên mitolojîk Adem û Hawa li ser vê axê bûn. Ma tofana Nûh pêxember ne li Mezrahotan bû? Keştiya wî hê jî li Ser Cûri ye. Yekî din, bapîren pêxember! İbrahim Xefîl jî, ji fêkiyên vê bihuştê bû. Zerdeş pêxember, Zulkîf pêxember û hwd. tev gulên vî welati bû. Felsefeya van tev bi mirovatî, xweşî û bi hezkirinê dagirtî bû. Ev war bi ramanen wan mîna baxçeya kulilkân hatibû xemilandin.

Welateki reng bi reng; xwediyê tişten cur bi cur. Mozayıqa çandê bêhna gulên biratiya gelan bû.

Lê pişt re....

Tev wêran kirin, xera kirin, şewitandin, berhemê dîrokî dizin û xwestin her tişti bixin bin erdê. Çiqas ew dîrok kûr û zexim bû, ewqas jî bi hovîti êrîş kirin ser. Dixwestin dîrokê çewt binivisinin, şaristaniyê tune bikin. Kulilk çilmisîn, dar û daristan hişk bûn, çem û kanî miçiqîn, ax ji tibûna hîviyê qelişî. Xwestin vî welati reng bi reng bêreng bîhelin. Yanê zindibûnê bidin kuştin û li her alî perdeyeke ji rengê reş bikşinin ser rûyê jiyanê.

Cima reş?

Lewre, di bin postalê taritiyê de bejnêne gulan tên şikandin, stûyên wan

bikin. Ji ber ku min hemû gewşînên wan pişafte...."

Di nava vê tariyê de çîrûsek derket û mîna birûskê li singê reşahiyê ket û ew çîrand. Tîrêjîn xwe berdan kûrahiya axê û dilê zinaran; ew rehêne gulê yên ku hatibûn hişkkirin bi jehrê, şûştin, can pê anî û gulê hêdî hêdî dest bi vejînê kir, geş bû û reng da.

Gula azadiyê;

Ev gul; gula hîviyan, gula vejîna hemû mîrxasên dîrokê û belavkirina bêhna azadiyê, di nav zinarê hêşin de serî mîna şêrekî li hemberî marê reş rakir. Ev zinarê ku tenê neketibû bin bandora marê reş, geleki hatibû hev. Wekî pola hişk bûbû. Gula azadiyê bi

Lê vêga?

Erê iro! Her tişti jî nû ve ji bin erdê derket û vejiya. Careke din gul û kulilkân serê xwe ji bin axê derxistin û şîn bûn. Mirovahiyê bejin avêt, bilind bû û sax da.

Bi ci awayî?

Gula azadiyê bi barana nîsanê, bi ava jiyanê mezin bû, sax da û rehêne xwe berdan kûrahiya dilê erdê. Ew gul bû çend gul, bû baxçeyek û bû welateki bihuştî. Dîsa herhî ji kulilkân hate xemilandin.

Bi bêhna van gulan, kor bi çav bûn, ker bi guh bûn, lal bi ziman bûn, qop meşyan, baş bûn û miriyêni li ser piyan ji nûh ve vejiyan.

Carekî din kanî der bûn, çem xuşîyan û wekî ku ji evîndara re sozê bidin herikin. Daristan şîn bûn, rez û baxçê bûn wekî derya. Adem û Hawa yên nûh dîsa meşyan di nav bihuştâ Aden de. Mem û Zîn, Leyl û Mecnûn, Ferhat û Şîrin, Dosto û Sînem yên nûjen vejiyan, di nav vê axa pîroz û giranbuha de.

Gula azadiyê mîna dara çinarê rehêne xwe wekî dara gûzê belavkirin. Edî tu bahoz û tofan nikarin wê hilbikin. Şaxek li Rojhilata Navîn, yek li Ewrûpa û yên din li her hêla cihanê. Edî her kes ji bin bandora jehra marê reş hişyar bû. Revîyan û li dora gulê civîyan; bûn yek û gula azadiyê bi cergîn xwe wan ji êrîşan diparêzin.

Ev gul bû çavkanî ji bo mirovahî û şaristaniyê. Mîna kaniyeke xurt di ciyayekî biliñd de; tim û tim ava zelal jê derdiket û derdikeve, van gulên din bi vê avê av dide.

Edî, her der hat xemilandin, dîsa ev war bû bihuşt. Ji rengê cur bi cur wekî keskesora li aşîmanan şewq dide, dibiriqe. Her alî bû bihar û li jiyanê bêhna misk û emberê li çar aliye cihanê belav dike. Ew bû bawerî hîvî, bû hêz di dilê hemû kesî de. Her kesî ev gul ji xwe re kir qible û berê xwe dayê. Her kes dixwaze were vê gulê bêhna bike, da ku ji hemû nexweşîyan xelas bibe, rihe xwe jî ji hemû qirêjiyan paqîj bike. Edî ew gul bû wekî ava kewserê; ki jê vexwe wê ji hemû nebaşîyan bi dûr bikeve, xwerû (sade) bibe û bibe wekî perîyan...!

MUHAMMED MUHAMMED



tên qurifandin, reng diçilmissin û hêdî hêdî jiyan jê dadirive. Hişk dibin û mîna hêstirê dilan pelgên wan diweşin û bi ber bayê payîzê dikevin û dibin berfa zivistanê de tên xeniqandin. Jiyan dibe koleyê mirinê û êsîrê tariyê. Di vê tariyê de koremarê reş jehra xwe berdide koka gulên azadiyê, wan hişk dike. Û ji çêlikên xwe re warê qirkirinê dide avakirin.

Kî ye koremarê reş?

Marê ku bapîrê wî ji gemariya dîrokî dihatin. Gulên ku bi vê jehrê û li se, vê gemariyê hatibûn şînkin, kê bêhna dikir pê serxweş dibû, ji cewherê xwe vala dibû, ji mirovahiyê û ji rihe neteweyetiye dûr diket, ji rastiya xwe re biyanî dibû û hebûna xwe înkar dikir. Marê reş ji xwe re digot: "Jehra ku min berdaye, çiqas zindî hene hemû tevizandine, nema karin bi sed salan xwe ji bin vê bandorê azad

kedeke mezin, bi hîviyeke xurt û bi moraleke bilind ew zinarê bazalt teqand. Lehengê navneteweyî yên dîrokî xwe ji gulê re kirin cihok, mîna çemê avê xwîna xwe herikandin ser koka gulê.

Bi derketina vê gulê re, marê reş çav pê ket. Axînî ji nav kezeba wî çû. Har bû û bi hovîti êrîş kir ser gula azadiyê. Pêşî jehra xwe bi ser de berda, lê bêfêde. Pey de bahoz bi ser de şand, dîsa bêencam û bêfêde. Herî dawî tofana bi xezeb, tofana hov bi ser de bi rî kir, dîsa jî tu fêde nekir. Giriya, li xwe xist, neçar ma ew marê reş. Ji ber ku bayê vê gulê di berbanga şefeqan de, di hînikahiya baharê de li ser xaka niştiman mizgîniya serxwebûnê belav dikir. Marê reş hêdî hêdî ji qidûm (teqet) diket, giyana wî ji laşê wî dikişî û ber bi mirîna bêdawî ve diçû.

□ 08.02.1925:
Civaka Azadiya Kurdan ava bû

Di sala 1922'yan de li Erziromê di bin serokatlyा Miralay Xalid Begê Cibirî de Civaka Azadiya Kurdan ava bû. Pişî vê avabûnê kurdan di bin sîwana vê civakê de di demeke kurt de li gelek deverên Kurdistanê desti bi xebatê rizgariyê kirin. Hêzên azadîxwaz amadevariya serhildanekê dikirin, lê pişî demekê Xalid Begê Cibiri û Yusuf Ziya Beg ji alîyê hêzên kermâslî ve hatin girtin. Şex Seid bi mîvani dije Piranê mala birayê xwe Abdurrahîm Beg ji wê derê mîfrezeyeke cendirmeyan digirin ser wan û ji Şex Seid dîkwazin ku hinek hevalen xwe testim bike lê ew vê yekê qebûl nakan û di navbera her du alyan de şer qedibe. Ev bûyer dibe sedem ku Serhildana Şex Seid berî dema xwe dest pê bike.



□ 02.02.1995:

Özgür Ülke hate girtin

Rojnameye Özgür Ülke ji allyê 'Dadgeha Sulh Cezayê ve bi hinceta ku berdewama Rojnameye Özgür Gündemê ve hate girtin. Wekî tê zanîn ji vê rojnameya watedar a gelê Kurdistanî gelek belavkar, nûçegihan û nîvîkar hatin girtin, hatin kuştin. Li hêla din di 4'ê berfanbara 1994'an de Özgür Ülke li navenda Stenbolê û li Enqereyê Ji hêla kontrgerîla ve hate bombekirin, avahlya navenda rojnamayê ji binî ve hate hilveshandin. Xebatkare rojnameyê Ersin Yıldız ji di vê bûyer de şehîd ket.

Pest û kotekiyan di 1997'an de ji dom kir

Li NÇM'a Îzmîrê bi navê "Panoramaya 97'an" panelek hate lidarxistin. Di pa nelê de nirxandin li ser rewşa hiqûqi, mafêni mirovan û huner ya 97'an, hatin kîrin. Serokê İHD'ya Îzmîrê Av. Ercan Demir, ji baroya Îzmîrê Av. Zeynep S. Özdogan û ji rojnameye Ülkede Gündemê Kazım Arslan besdari panela ku roja 23'ê röbendanê pêk hat, bûn.

Di panelê de axaftina yekemîn ji hêla Av. Ercan Demir ve hate kîrin. Ercan Demir got ku çeteyên ku ew bi salan e qala wan dikin di sala 1997'an de eşkere bûne. Her wiha Demir pêwîstiya teşhîrbûna çeteyan ji bo gelê kurd, parêzeren mafêni mirovan, parêzeren demokrasiyê anî zimîn. Ercan Demir axaftina xwe wiha domand: "Di sala 1997'an de ihlalên mafêni mirovan ji ber dijberiya (muhalefet) civaki, pey-

wendiyen bi Yekîtiya Ewrûpayê re li gorî salen berê kêmîtir e. Li bajaren Kurdistanê ev yek pêk nehatiye, li vê derê işkence, di bin çav de windakîrin û cinayetên failî meçhûl roj bi roj dom'kirine. Li Tirkîyeyê çeteti û durûti teşhîr bûye, lê ev yek ne bi bandora hêzên demokrat û bi aloziyên di nav bîrdozê de pêk hatiye. Lewre ji ev guherin ne mayînde ne. Ev yek nayê wê maneyê ku demokratikbûn pêk hatiye."

Ji Baroya Îzmîrê Zeynep Sedef Özdogan got ku li Tirkîyeyê darêzgerî (yargı) ne serbixwe ye. Özdogan bi bir xist ku Yekta Güngör Özden bi xwe ji ev yek gotiye, lewre ji darêzgerî li Tirkîyeyê riziyaye. Özdogan got

bi bir xist ku bîryarê 28'ê reşemiyê yê MGK'ê ji bo faaliyetên derdorêن welatparêz û demokrat bidin sekinandin e.

Pişti van bîryarê di sala 1997 an de navenda çandê bûne hedefen gelek êrişan. Her wiha Arslan got ku dewlet di vê salê de êriş bîriye ser gelek rojname û hunermendênu ku şerê qirêj teşhîr dikin. Arslan di dûmahîka axaftina xwe de got: "Dewlet, ji bo rê li ber gesbûna çalakiyên welatparêzan bigire, êriş bir ser kes û saziyan, xwest çeperê li wan teng bike û di warê aborî de wan bixe nava tengasiyê, bi vî awayî ji kes û saziyêna welatparêz teslim bigire."

A. WELAT/ÎZMİR

**CAVDÊRÎ**

Îdeolojî ne kînc e ku
mirov her dem
biguherîne

**AMED TÎGRÎS**

Di navbera salen 1974 û 1984'an de di nav gelek hêz û kesen kurd de bîr û baweriya sosyalîst gelek xurt bû. Parû û hêzên kurd ketibûn pêşbirika sosyalîzmê. Bayê sosyalîzmê kurd dabûn ber xwe û ew dibirin. Kijan rîexistinê doza kurdan rewa bidita an ji kî bigota: "Ez kurd im", ew otomatîk dibû sosyalîst. Wekî ku di nav kurdan de çînek hebe û ew jî çîna karker û xizanan be. Bîst-sî milyon û yek çîn! Xwedîyê çend gundan bûbûn endamên partiyê komünîst û sosyalîst!

Ev ji çî dihat? Bi tenê di riya çepgiriyê de kurd dihatin qebûlkirin, heta navê wan dihat gotin. Ji derî îdeolojiya sosyalîst, îdeolojîyenîn nîkaribûn li Kurdistanê bijîn. Rewş wiha bûbûn ku ew kurdênu ku di nav partiyê dewletê de bûn jî ji xwe re digotin, "Em jî sosyalîst in." Ecevitî nîjadperest pişti sala 1970'yi "Karaoğlan" an jî "Eco"yê kurdan bû. Wî herî zêde ji Kurdistanê deng digirtin.

Îdeolojî ne mode ye û ne jî kîncê wiha rîngin e ku her kes li xwe bike. Bingehêne wê yên aborî û civakî hene. Felsefe, dadmendî, zanist, huner, çand, dîn û tore li ser bingeha rewşa aborî û civakî ava dibe. Di van mijaran de karker an jî gundiye kurd, axa an jî kapitalîstekî kurd ne mimkûn e ku wekî hev û din bifikirin.

Mirov dikare bibêje, di teoriye de her çiqas mijar zelal bû jî, lê di pratîkê de heta 1984'an rewş şelo û aloz bû. Pişti 1984'an, bayê şoreşê mij û moran da ber xwe û bir. Li ser ax û asîmanê Kurdistanê sayî û zelalî derket holê. Birûska şoreşê li wanî hêz û partiyê Kurdistanê yên reformist xist; xêlî û pûşîya li ser çavên wan çiriya û rû rûcîken wan derket holê. Bizdiyan!

Ber bi salen 1990'ı ve erdhejeke dijwar li sosyalîzma reel ket, ew qelişî û ji hev ket. Çirûskên birûska duymenîn li piraniya hêzên kurd ên ku ji xwe re digotin, "sosyalîst" ji ket. Vê carê ew bi derbekê bi erdê re cûm bûn...

Ji ber ku piraniya parti û hêzân, baweriya wan bi xwe tunebû, hem bi îdeolojîk-politîk û hem ji bi rîexistin û fiziki xwe spartibûn hêzên komünîst ên welatên dagirker û bi riya wan dixwestin xwe bavêjin bextê welatên sosyalîst. Wan dixwest, bi taybetî ji xwe bavêjin bextê Sovyetistanê. Dema têkçûna sistema sosyalîst û Yekîtiya Sovyetê dîtin, yek bi yek têkçûn û belav bûn. Gelek serok û kadroyen wan ên rajorîn, dev û dest ji şoreşgeriyê berdan û hinek ji wan wekî berê ketin nav sistema dewleta tîr, di nav hinek partiyen wan de cih girtin. Birek ji wan jî bûn aşbetal û dest bi bazirganiyê kirin. Hinek ji wan jî, li derveyî welêt 180 pile zivirin û di şevekê de bûn "liberal".

Di bingeha xwe de tiştek nehatibû guhartin, ew hem wekî şexs û hem ji wekî rîexistin wiha bûn. Lî de pêşbirika sosyalîzmê de dixwestin gelê kurd û Kurdistanê di nav mij û moranê de bixapînîn. Niha mij û moran rabû, eyam zelal û diyar bû. Lî ew di bin kijan perdeye de an ji li ser navê kijan îdeolojiyê siyasetê bikin, ruhê wan ê koletî û xulamtiyê nayê guhartin. Wan kes û derdorênu wiha, iro ji hêvi bi welatên împeryalist-kapitalist ve gîredane. Do dê Sovyetê vîri bikiran, lê nebû iro ji dê welatên împeryalist wàn rizgar bil. Dê b. vê xeyale bimîrin û li biyanistanê herin gorê. Ji niha ve rehma Xwedê li wan û partiyen wan be!

Dengbêj Rêber: Em hewcedarî akademiyeke kurdî ne

We kengî dest bi dengbêjîyê kir. Çawa we xwe nas kir û ev riya ku we daye ser, hilbi-jêri bû an jixweber bû?

◻ Destpêk bi sirûdên oldarî bû. Di bin bandora softiyê û bi xwendina Quranê min nas kir ku ez dikarim bistrêm. Min di şevbûhêrkên bi doston re stran gotin û di xortaniya xwe de, min gelek saz ji ber kiribûn û gelek stranê Aramê Tigran û M. Arifê Cizrawî digotin. Hêdî hêdî min dit ku ji dengê min tê hezkirin û kesen li derdorê min jî kîfa xwe ji dengê min re diyar dikirin. Wê demê ez li Şamê bûm, li wir di sala 1980'yi de,

ez di "Koma Kawa" de wekî dengbêjekî bûm. Me rojê Newroz û cejnê kurdan li dar.dixistin. Di 1982'yan de ez hatim Helebê û di 1983'yan de, me "Koma Armanc" ava kir. Tu dikarî bibêjî bêtir karê min di hundirê koman de bû.

Hûn yek ji damezirînerên Koma Armanc a mûzik û strana kurdî bûn. Vê komê demekê li Başûrê Biçük deng dabû. Pişt re kom tarûmar bû, tistik tê de nema. Hûn ci der barê damezirandin û hilwesandina vê komê de dibejin?

◻ Hêviya me hebû ku me tiştek ji gelê xwe re bikira. Me didît ku hêzê-

ke hunerî li cem me heye, me jî xwest em riyekê ji derxistin û pêşkêşkirina vê hêzê re bibînin. Û folklora miletê xwe ji bin tozê derxînin. Ji bo vê ye-kê me kom damezirand, da ku bi rengekî nûjen em karîbin strana kurdî pêşkêş bikin. Her wiha amûr jî, wê gavê, tembûr bû, lê koma me amûrên wekî ûd, keman, akordiyon, gitar... bi kar dianîn. Vê yekê rengekî nû wê çaxî da stranê kurdî li vir.

Di 1984'an de me kaseta yekemîn derxist. Nêrin û dîtinê gel û piştigiriya wî hişt ku pişti salekê tenê em kaseta duyemîn derxînin. Û wê demê di 1985'an di Cejna Newroza yekemîn de ku li Efrînê eşkere çebû, Koma Armanc pêşkêşî kir. Di wê Newrozê de hunermend. Mihemed Şêxo ji besdar bûbû. Me ji Newrozê hêzeke nû girt û kaseta sisîyan jî derket. Lî wê gavê ez ne di komê de bûm. Û têkiliya huner û siyasetê dîsa bi awayekî şas serê xwe rakir. Partiya kurdî ya ku piştigiriya komê dikir biryari bi temamî ji dest me girt û endamên ku wan dixwestin didan pêş û li şabaş û avêtina sloganan digeriyan. Gelek problem di nav me de derketin. Li gel vê yekê jî dîsa kaset ji hêla hunerî de ne xerab bû. Karê di komê de bi şer diket, ji ber ku karekî gelempêri bi tevahî û zêdeyî dengekî di kasetekê cih digirt.

Û di bin bandora doston de ez ve-geriyam nav komê û min di sala 1988'an de kaseta xwe ya çaran derxist. Di wê demê de dîsa şerê di nav-bera huner û siyasetê de germ bûbû. Me digot divê strana kurdî ne ya îdeolojiyê bi tenê be, divê bêtir bi jîyanê ve girêdayî be û di nav me û di nav vê partiyê de şerekî eşkere derket û li di-jî belavkirina kasetê derketin tevî ku ji hêla hunerî de ev kaset gelekî bilind bû. Di vê qonaxê de sê endamên komê hebûn; ez û Mistefa Osê û Mistefa Horo Me bi hunermendên gelên din re, ermenî, ereb û sûryaniyan re têkilî danîn. Xuya kir ku ev berhemên me ne ew qasî kûr in û ne li gorî daxwaza me ne û divê bi rengekî zanistî û akademik em bi hunerî re têkevin têkiliyê.

Jî hêla din ve partiyê dixwest çend kasetan bifroşe, slogan û propoganda partiyê belav bike. Xwestin me bi hinnek endamên din biguherin û her tiş xera kirin. Me berê xwe da xwendina

akademiya mûzikê, wan jî berê me dida avêtina sloganan.

Li ser zarotiya xwe jiyana biçûkanî, şax û damarê zarotiyê xwe dirêyik din. Hinav û hestên her dengbêjî, vê qonaxê di jiyana we de bi ci awayî bandora xwe li ser we hiştîye?

◻ Zarokatiya min li gund bû, gund ji ciya bû. Dengê ciyayı, dengekî bilind û suriştîya ciyê pir xweşik e. Gelek wêneyên spehî hene ku xeyala mirov zengîn dikin. Li gund em li hêviya bihîstina strana kurdî diman. Me li radyoyêng Dengê Erivan û Dengê Bexdayê guhdarî dikir. Belê.... di dîlanan de, li serê govendê, tim yekî ku bi serê dîlanê digirt hebû û stran digotin. Her wiha zarok jî dixwaze balkes be, xwe dixîne kirasê yekî bi nav û deng ji bo ku balê bikşîne ser xwe. Ligel bandora meletiyê jî bavê min mele bû bang dida, dengê wî pir xwes bû û min alîkariya wî dikir. Vê yekê bandora xwe li ser min wekî kes û li ser strana min jî hiştîye. Û ev kaseta min ya pêsi "Dil yek e" ku di sala 1997'an de hate tomarkirin, di bin vê

Dengê Erivanê jî gî strana 'Li serê ciyâna Kurdî dibêje ya in. Û strana "Ez xe Serbest e, gotin û Bektaş û Şêrînê jî e

bandorê de ye.

Navê we bi Koma Armanc ve hate girêdan û pişti bêdengiya komê hûn jî demekê bêdeng man, heta sala 1997'an, we niha kasetek bi navê "Dil yek e" derxist. Hûn çawa van her du qonaxan didin ber hev?

◻ Pişti 1989'an me dest ji komê berda. Me xwest em komeke serbixe we çebikin û van kesen ku xwediyê imkanen hunerî ne bidin ser hev. Şerê me gelekî kirin û di nav civakê de gelekî zîrar gîhandin navê me. Ev kar berdewam nebû. Me dit ku ev ser-



RÊBER KÎ YE?

Di sala 1959'an de li gûndê Rûtayê ku girêdahîya herêma Efrînê ye ji dayik bûye. Yazde salî bû dema ku dest ji gûnd berda, çend sal di navbera Efrîn û Şamê de borandin. Di sala 1982'an de li Helebê bi cih bûye. Ji 1976'an de pişt dîye xwendina oldarî û ji bo ku bikaribe jiyana xwe bidomîne dest bi karê terzîtiyê kiribû. Lî ew tim û tim bi stran û awazan re heval bû.

bixwebûn ne mimkûn e. Ne ji hêla aborî ve û ne rewşa siyasî ya welat rî dîda vê yekê. Di 1990'ı de min xwest ez kasetekê derxim. Lî ji hêla aborî ü teknîkî ve rewşa min ne li ser hev bû. Vî karî ez pir bi şûn de xistim. Mal û zarokên min ji mafê wan li ser min hebû û pêwîst bû ku ez tiştekî ji bo wan bikim. Sê zarokên min hebûn û ez bêmal bûm. Me stran digotin, xelkê kêfa xwe dikir û em jî di hundirê xwe de diqîriyan. Karê ji bo aboriyê dîsa berê min da Şamê, lê têkiliya min bi stranê re berdewam bû. Min distira, lê di riyan teng re.

Sala 1995'an min malek kirî û zarokên min bi cih bûn û ji ber tunebûna ragihandin û sazgehê kurdî tu rî tunebûn ji bo ku em dengê xwe derxin. Min û Mehmûd Ezîz û Ehmedê Çep me komek ji bo dawetan çêkir. Lî piştî demekê, me dît ku rengê têkiliya bi dawetan re rengekî erzan e. Di nav têkiliyan de hunermend pûç û erzan dibe û têkiliyeke ne dirust e. Me xwe di wir de jî nedît.


Di 1997'an de min kasetta xwe derxist û di nav her du qonaxan de. Kom dema karekî dike, karê gelek kesan dibe yek û karekî bi rîkûpêktir derdi keve holê. Di vê kasetta min de, ez jî teknîka wê, tomarkirina wê nerazî

çiya sêvek gihaye' ya ku Şehîbana Kurdî dibêje ya me ye. Gotin û awazîn min in. Ü strana "Ez xerîbe wela-tê me" bi dengê Serbest e, gotin û awaz ên Perîşan in. Murat Bektaş û Şêrîn jî ev stran gotine. Her wiha stranê folklorî yên ku hatibûn jibîr-kirin (Xanê, Yêmê, Emo) heta niha, li dawet û şâhiyan di nav gel de tên go-

Li Başûrê Biçûk, rewşa muzîk û strana kurdî hûn çawa dibînin? Ci li ber çavan heye? Ci di riya pêşxistina muzîk û strana kurdî de diyar in?

□ Strana kurdî tim "ferdiye" hunermend bi xwe rî ve dike. Aram, M. Ezîz, S. Yusif, M. Şêxo... evê naskîrî ne. Sazgeheke kurdî tuneye ku dengbêjê kurd hembêz bike. Ma wê hunermendê belengaz ci bike? Têkiliyên hunermendan xwe bi xwe jî qels in. Mînak Seîd Yûsif, sazbendekî baş e, lê ew dixwaze dengbêj û muzîkvan û sazbend be, û her tişt be ji.

A niha tiştekî hêjhî li ber çavan tuneye. Di nav gelên din de, sazbend, dengbêj û nivîskarekî stranê, her yek cuda ye ji yê din. Li nav kurdan tê genim biçînî û tê aşvan bî û tê arvan bikî hevîr û tê hevîr bistirêyî û tê nan jî çêbikî, dawî dibe ku nan şewîti derke-



şik hevdû nasbikin, pişt re divê em li deriveyî sînor binêrin. Tu çalakiyên min di vê riyê de tune ne. Lî girîng e ku, têkiliyên bi vî rengî hebin. Süde-

ne. Dengekî baş û nivîskarekî baş û sazbendekî baş dikarin stranekî baş bidin. Karê me jî ev e ku em li ber xwe didin. Tev li vê rewşa xerab, dîsa em şopa hunerê bernadin û em bi hêvî ne ku rojekê straneke kurdî bi sewiye di asteke bilind de saz bibe.

Di pêşerojê de hûne ci bikin? Ci projeyen nû di nav desten we de hene?

□ Kasetek nû di nav destê min heye. Ez li ser dixebeitim û dibe ku di sala 1998'an de bigihê ber destê guhdaran.

Gotina dawî;

□ Ev bênişkirina hunermendan ji bo ci ye? Hinekên din stranê me dibêjin bêyi ku bidin nivîsandin ku ev stran xwedîye wê kî ye. Mesela MED-TV têl li hawîrdor me huner-mendên qels û bêkêr didin pêş, bêyi ku li bilindi û nebilindiya hunerê bipirsin. Mînakâ din strana "Li ser ciyan..." ew qas car di MED-TV derdi keve bêyi ku bê gotin stran, deng û awaz yê kî ne. Ragihandin hêzekê di de hunermend û wî bi pêş de dibe.

ji stranê me derxistin û
gihaye' ya ku Şehîbana
ye. Gotin û awazîn min
e welatê me" bi dengê
en Perîşan in. Murat
stran gotine.

bûm û vê yekê sistayî dida deng jî.

Di encamê de, serboreya Armanç hûn çawa dinirxînin. Ci stranê navdar li dû xwe hiştin. Gelo tu şop di warê starana kurdî de hişt an na?

□ Serboreya bi nirk bû. Lî heta niha komeke hunerî xewnek e û bi te-na xwe û bê pere mirov nikare tiştekî bike. Projeya sazkirina komeke hunerî hîn hêviya me ye.

Gelek stranê folklorî û yên afîrandî jî hene, heta niha li ser ziman-an tê gotin. Dengê Erîvanê jî gelek ji stranê me derxistin û strana 'Li serê

ê sazgeh û ragihandin hunermend pêş nakeve. Ne kadro û ne pere û ne sazgeh û ne rexnegirê muzîk û stranê kurdî hene. Dengekî baş û nivîskarekî baş û sazbendekî baş dikarin stranakî baş bidin. Karê me jî ev e ku em li ber xwe didin.

ve. Em bi hewceyî akademyeke kurdî ne. Mûzîka kurdî kesen nezan bi kar tînin. Li hemberî sewiyea muzîkê li cihanê em fedîkar in ji ber vê mûzîka niha bi kar tê. Ji bo pêşxistina muzîk û strana kurdî karekî gelemperi, tevayî, pêwîst e. Divê piştgiriya hunermend bibe.

Wekî hunermendekî kurd we ci gav ber bi kurdên li pişt van sînoran avêtine? Gelo tu çalakî û bizav di vê riyê de hene? Gelo pêwîst e ku bi kêmanî kurd hev û din nas bikin?

□ Bila di hundir sînor de em xwe-

Çend mînak ji helbestê nûjen

DIBISTAN

Xaniyê belengaz dê çi bikira

Bazar ne tu bazar bû

Qûmasfiroşî jî karê betalan

Lê ya ew zû hatibû

Ya jî em dereng man

Xaniyê me yê neçar dê çi bigota

Kesatî bûye bela serê me

Dewra çarixê bihuri

Malikhanê Etrakê ava bike

Memê min i şekal pêkîrî

Zînê dibêjin ax Zînê

Niha li Dêrsimê çi şer e

Bes karekî me ma

Ilm û izan û zanîn

Dê zora bazara kesat teqez bîne

Ü yar û neyar divê bibînin

Li tenîş toraqa eyêr

Me edeb û huner û çand jî heye

Kawa Nemir ■

QELEN

Feleka xayin

Ji xelkê re

Şîr û mast

Ji me re

Êş û jan

Xem û kul

Didoşe

Ka bêje

Ey feleka xayin

Qelenê te

Çend quriş e?

Ger xwîn bixwazî

Va ye ez serê xwe

Datinim

Li ber xencerê

Pêşî min bikuje.

Berken Bereh ■

QEY

-1-

Rûyê te dibînim di yê keçeye filistîni

de

Ü porê te

Tu dibêjî qey ji çiyayekî Cheapesê

standiye bêhna xwe

Ü mirov dibêje qey

Tu tenê ji bo esmerbûna xwe hatiye

bışaftin

2-

Baş e

Evîna te xweş e

Bes, zêde bi min nebişire

Ü bi wan çavêr reş, nekene bi min re

Ez dibêjîm qey ez bûme gerîlayek

Ü tu jî kulîlkek nûbişkuvi li ser riya

Diyarbekirê

İbrahim Seydo Aydoğan ■

TE TEJİKA MİRİNAN

LI BER MIN RAXIST

DA EZ YEKÊ HILBI-

JÊRIM

1

Wexta awira dawî

Ji agirê sê hezar sal seqakiri

Te di çavêr min de çikand

Xwîn jî çavêr min rijiya

Ling di xwe de fetisand

2

Wexta awira dawî

Ji zencîrên zengarı

Te li zendê min pêça

Deh tilî ji destan weşîyan

Li hev nérin

Ü xwîn giriyan

3

Wexta awira dawî

Ji kelehên qedexe

Te li gewdeyê min pêça

Du destan-xwe bi wan ve xeniqand

Ü bi çûna xwe re

Te tejika ji mirinan neqîsi

Li ber min raxist

Da ez yekê ji xwe re hilbijêrim

4

Min rişma xwe

Bi du cîmîn dêlikekê ve girênedâ

Bi tu avahiyê bilind ve

Min xwe nexeniqand

Tu kaxezên nirx-buha

Li devê xwe nepêça

Min xwe bi serderâ

Dilê zarokekî kurd ve daliqand

Ü xwe

Di wê de veşart

Hemdullah Bakî ■

TALDE

Di taldeya dil de

Me gulek heye

Reha wê li Zagros

We malek heye

Bi heft agiran naşewite

Me hêviyek heye

Di lûleya tifingê de can e

Cihan Roj ■



Li Navenda Çanda Mezopotamya Stenbolê

● 31.01.1998 Şemî: Konsera Koma Çiya: saet, 14:00

Film/Awira Ufş, saet: 17:30

● 01.02.1998 Yekşem: Konsera Koma Rojhilat, saet: 14:00

Film/Bisikletajo, saet: 17:30

● 04.02.1998 Çarşem: Gotûbêja Rojnamegeriya Kurdi: Azadiya Welat,

saet: 18:00

Li BEKŞAV'ê

● 31.01.1998 Şemî: Konsera Koma Rojhilat, saet: 18:00

CALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li NÇM'ya ïzmîrê

● 01.02.1998 Yekşem:

Çalakiya Piştgiriya Komîsyona Jinê HADEP'i, saet: 14:00

● 04.02.1998 Çarşem:

Panel: 'Dengê çapemeniya azad nayê birîn', axıver: Gürsoy Turan (Emek) Derya Bektaş (Ülkede Gündem), saet: 18:00

● 06.02.1998 În:

Teatra Evîna Welat: Govenda Hilo,

Nivîskar: Hüseyin Kaytan, saet: 18:00

Di çapemeniya kurdi de qonaxek:

Kovara Rewşen

"....Em dixwazin eniyeke zanist, çand u hûnerê çêbikin. Neteweya me ji aliyê çandî ve jî di bin zor, zehmetî u sîtemê de ye. Her wiha çanda me ji hatiye dagirkirin..."

Belê, ev gotinê jorê; ji hejmara yekemîn a Kovara Rewşenê, ji nivîsa derketina ku bi sernavê 'Çima Rewşen?' hatiye wergirtin. Ev kovara navborî di 1'ê reşemiya 1992'yan de li Stenbolê ji hêla Navenda Çanda Mezopotamya ve hate derxistin. Bêguman' ev kovar yek ji kovar u rojnameyên ku pişti salê 90'î wekî berhemâ tevgera rizgariya derketibûn bû. Kovara Rewşen ku bi zimanê tirkî u kurdi weşana xwe dikir, pişti hejmara 23'yan êdî nema derket.

Ji aliyê dîtbarî ve dema em kovarê hildin dest, em dikarin wiha bibêjin; li bin navê kovarê bi kurdi wiha hatiye nivîsin: Kovara çandê, li milê çepê yê Rewşenê, ligel logoya wê ibareya NÇM'ê hatiye nivîsin. Di rûpelan de ji hatiye nivîsin ku mehê carekê tê weşandin.

Xwedîyê Rewşenê İbrahim Gürbüz, Serkara Karên Nivîsan Edibe Şahîn, Rêveberê Karen Weşanê Hüseyin Kaytan, Berpîrsê Têkiliyêni bi Gel re ji İbrahim Genç bû. Her wiha di kovarê de lijneya weşanê ji hebû ku ji van navan pêk dihat: Hasan Bildiricî, Feqî Huseyn Sağnîc, Ali Temel (piştre di nav refîn ARGK'ê de şehîd ket), Abdurahman Durre, Hüseyin Kaytan, Mehmet Gemsiz u İbrahim Genç...

Yek ji xebatkarên Kovara Rewşen Esma Eksen ku niha ji di nav xebatêni Jiyana Reşwen de cih digire li ser pêwîstiya derketina kovarê u misyona wê wiha vedibêje: "Ji ber ku wê demê (1992) di nav civaka kurd de guherînê xurt, serhildanê hêja û çalakiyên bi nîrx pêk dihatin, pêwîst bû ku ev nîrx û hêjahi di berheman de bi



cih bibin. Li hêla din nebûna kovarê kurdi kêmasyek bû u valahiyek derdixist holê, hewcedarî bi kovar u rojnameyên wekî Rewşen u Welat xwe eşkere dikir. Rewşen ji li ser vê misyonê şax da, pêwîst bû ku edebiyata nivîskî u devkî di nav rûpelan de cih bigirin u ji dirokê re bibin mal." Eksen di warê kêmasyan de wan rojan u iro dide ber hev u dide zanîn ku wê demê her çiqas germahî u nêzîktêdayineke xurt di warê çap u belavkirinê de hebe ji, di warê kadroyen ku bi kurdi dînîvîsin de kêmâsi zêde bûne. Li gorî gotina Esma Eksen Kovara Rewşen 4500 heb çap dibû tiraja wê tu carî ji sê hezâri daneketiye. Li hêla din Eksen diyar dike ku der heqê du hejmarê kovarê de doz hatine vekirin u ev hejmar bi awayekî nehêni hatine berhevkinin.

Ji aliyê naveroka nivîsan ve, em dikarin bibêjin ku li gel gelek nivîsen çandî, dirokî, zargotinî u edebî bi zimanê tirkî-kurdi (zaravayên kurmancî, zaza-kî, soranî) nivîsen siyâsî ku bi jiyana şervanê têkoşinê u rewşa welat ve girê dahî bûn ji, dihatin weşandin.

Wekî encam em dikarin bibêjin ku gelek kesen wekî Bekir Bahoz, Cemil Gündoğan, Mahmut Ahmed Muhammed, Abbas Alkan, Medeni Ayhan, Faiik Bulut, İ. Xort, F. Huseyn Sağnîc, Yaşar Kaya, Hüseyin Kaytan, Kaya Müştakhan, J. Espar, Loqman Polat, Ehmed Şerifi, Celila Celîl û hwd. Ji bo Kovara Rewşen nivîsine. Her wekî din di kovarê de, wêjeya cihanê ji di nav de, wergeera gelek helbest, şano u nivîsan cih gitine.

SALIHÊ KEVIRBİRÎ

Nazım Yüce (Xeyriyê Res)

(25 rîbendan 1998)

Min navê dilê xwe
danî şoreş! u di
gewdê Xeyriyê dilop
dilop dînîqite de
min mirin ji çavan
maç kir!...


Dema min gewdê
Kemal ê zirav ku di
dinê di hilnayê hem-
bêz kir...
mirin giriya
u rûyê xwe qelaşt!
Aj da ji nû ve gulén
biharê
jiyanê di dilê mirinê
de reh berda
u mirin kuş



Nuray Şen

Tîşk

Se ser o ke
Kurdistan kena tal



KAZIM TEMÜRLENK

1890 de ke gure xelesa hermeniyo xof kerd zerre Abdulhamîti, wast ke virendiya hermeniyan bicero. Kirmanc jî, osmaniyan gore zaf xoser bî, hetê ra çî wastena ke ïnan jî boncê werteyê weşîya dewlete. Ebe nê hurdmîna fikiran Abdulhamîti Alayê Hamidiye vîraşti. Hermenî u kirmancê ke neçe seri piya weşîya xo ramenê, ebe fuzulîna Osmaniyan jübîn ra bî dişmenî.

Osmaniyo de fendî (kay) zaf bî. Propagandaya misilmanîne ra kewfî raye, hermeniyo rî vat ke gawir. ê, hend kenê ke Kurdistanê kirmanco dest bi bicerê. Ebe des û du dubaro talkerdena Kurdistanî dest kerd ci. Alayonê Hamîdi be eskere tirkî ra piya dest kerd qirime hermeniyo.

1.500.000. hermenî ya ebe qersuno qir bî, yakî rawora serd, sext û vesaniye ra kişiyyat. Hermenî hama hama %95 ya kişiyyat, ya kî welat xo ra vejîyay şî surguniye. Talkerdena Kurdistanî bingê xo qirime hermeniyo ra cena. Osmaniyo ke hermeniyo ra xelesiyat nafa ku dest est kirmongo. Hata hona ke qirime hermeniyo dewam kerden, taye kirmongo çî nesîbê xo na qirim ra guret. Onca na dem de Suryaniyo, Nasturiyo çî qirim ra verd ra. Osmaniyo mabene kirmango, de aşîrtîne ra, mesesbîne ra çî qewete gurete, na dem de kirmango ra 700.000 mordem surgun kerd.

Ceng Dîna verîne ra dima fîrsendo de girs kut deste kirmanco. Osmaniyo ceng kerd vînd, Kurdistan de hukme dewlete şîkiyay bî. Kirmanco ke serba qedere xo bigûriyene ze degelone bîno yî çî biyene azad. Ebe na fikir Stembol, Erzirom, Diyarbekir û xele cawo de teşkilate kirmanco biye. Zanoxe Kirmanco serba xeles guriyay.

Nafa çî Atatîrkî, kirmancî kerd ra xo çim. Raver şî Erzurum, dima Sêwaz de nema birayine ra kongrey vîraşti. Çığa ke itawo de birayîne ser wêjdene çî, heto bîn ra çî çime xo boyna teşkilatone kirmanco sero bî. Xora Atatîrk wîrte qirime hermeniyo de ca guret bî. Hermenîyo ra dima sîre de îndî kirmancî est bî. Atatîrkî raver 72 mebûşî guretî parlementoye tîrko, dima dest kerd qirim û surguniya Qorçîriye. Peydo raporone valiyo ra çî vejîno wîrte ke, Kurdistan sero xele plan û projevî viraste. Hergü mintiqâ sero plane virasta. Taye cawo re vato tal kerme, taye cawo re vato tîrko biyarme wîrte kirmanco kîme. Taye cawo ra çî qirim û surguniye veta.

Qoçgîriya ra dima Nafa çî dest est dorme Amedî, Çewlîgî. Qirime Şêx Seîd de na rind vejîye werde. Harna tîrko plane xo zaf qurnaz dewam kerdene. Mintiqâ be mintiqâ kare xo dene are. Şêx Seîd ra dima sîre da Qozo, Axrî dima çî xora Dersim mand bî. Nîno kero çî ze sakî verd ra. Ebe se hazaro mîlet qir kerd, ebe se hazaro mîlet surgun kerd. Peydo dest kerd bingê kirmongo biyare. Yîyê ke qirim ra dima mandî bi guretî wîrte politika asîmlaşyon. Zon, kültür, adet û torey, kamiye, namey, kînc kolî yasax kerdî. Domanî day are kerd, wendexano ke, kirmancîne xo vîra bikere, tîrko bê. 1980 de îndî kertî ke mand bî ke, kirmancîne biqedîyo.

(Dewamî ci esto)

Berxika şîr û gurê devbixwîn

Li devê çem sekinibû gurê har
Berxika şîr hate wê derê av vexwar

Gur ji jor de xwe berda hate balê
Pir bi hêrs bû çêr kirin berxika salê
Got:
Te ji kê destûr stand û hatî vir?
Ew ava min a zelal te şolî kir

Tu nizanî ev der hemû ya min e
Ji min pê ve para kesî tê tune

Tev ên min in çem û kanî dar û ber
Wargehê min e nahêlim kes were ser

Ji tırsa re dilerize berxika şîr
Belê jîr bû bersivek da gurê pîr:

Binêr apo ez nizanim tu kî yî
Pir bi hiş i an jî tu pir birçî yî

Tu dibêjî te şolî kir ava min
Ez li jîr bûm neçûye jor gava min

Ji bo avê tu carî neke mital
Ji jîr de şolî nabe ava zelal

Tim ji jor de diherike ava çem

Te dît li jîr min av vexwar nexwe xem

Ez nizanim tu ji bo çi qehirî
Ji nedî ve te hat riya min birî"

Gur rabû got: Tu pir zêde axivî
Te re dibêm zûka bigire wî devî

Min paşgotin ji te bihîst şala par
Û wî sûcê giran li xwe nekir bar

Ne yek ne du ev bû çend car ji bo min
Ew qisê te hemû hatin guhê min

Berxik şâ bû di ber xwe de keniya
Ji kêfa re list û rabû ser piya

Got: Bawer bik, ez tunebûm sala çû
Ji dayik re ez çêbûme îsal nû

Min bi hina dişibînî ku ez im
Ewê qisê kirine te ne ez im

Par van çaxan nehatibûm dinyayê
Pir biçük im min nuh daye dûv dayê

Gur dibêjî: Nexwe ew xwişka te bû
An kekê te, dizanim yek ji we bû

Berxik dibêjî: Kesek nîn e xwişka min
Ji min pê ve zarok nanî dayka min
Biçük—mezin birayê min tune ye
Wa li malê dayika min tena xwe ye

Tu dixwazî wa mala me li wir e
Her bibîne, tişte min got ne vir e

Yê ku qisan dike nayê dor te
Tej bîr kiriye ew kes nayê bîra te

Ma ji bo çi qisan bikim ji te re?
Tu li vir dijî, em jî li wir ji xwe re

Her du çavên gur tijî bûn xwîna sor
Wekî dîna digeriya hawîrdor

Got: Ew kesê ku dibêjîm wekî te bûn
Ne biyan bû bi eslê xwe ji we bû

Ew jî mîna te her tim dibariya
Bê dê û bav li van deran geriya

Dê û bavê te ji min re dijmin in
Malbata we hemû guhdarê min in

Natorvanê we bû seyê guh dirêj
Bilûrvan bû ew şivanê wey dengbêj

Min nikaribû ji mala xwe derkevîm
Hem hêşîr bûm min nikaribû birevîm

Gava ku ez daketema dora pez
Seyê we yî har dihat min bi gez

Gelek tadeya we li min hatiye
Tu nabêjî yê li dijmin ev kî ye

Tu dijmin i binêr çavê xwe veke
Hem súcdarî bo wê dengê neke

Ji bîr nakim tada dê û bavê te
Ger te bixwim winda bikim navê te

Berxika şîr rabû li dor xwe nêri
Hêviya wê kesek nebû da girî

Di ber xwe de got: Çi hate serê min
Ez çi bikim neket xêrê berê min

Ji gur re got: Bo firek av hatim vir
Çi xisara min li te bû apê gur?

Ka min berde ezê herim mala xwe
Têr şîr bixwim nuh dagirim sala xwe

Paşê gotî: Ez biçük im gune me
Ez şêrîna ber dilê dayika xwe me

Wext dereng e ka min berde bû êvar
Berxika şîr pir rica kir gurê har

Gur jê re got: Ji bîr nakim wê tolê
Ger te bixwim, iro rakim ji holê

Da te nexwim tu car nayê xewa min
Tu dijmin i bo te nîn e efa min

Êrîş kir ser berxikê gurê çepel
Devgilêz û ew xwînxwarê çav nexel

Çavbirçî û hov û harê pir qeleş
Bi wî goşte rexid dagirt ew zikê reş


Ne maf nas kir, ne dadger û ne dozger
Çem û kehnî kirin yê xwe seran ser

Got: Ez gur im ez çi bêjim ger bibe
Bêmafi û zilm û zarî ger çi be

Yê li ber min şolî bike wê avê
Ezê seri hilqetînim wê gavê

Mina gurê devbixwîn in hin mirov
Tim berxikê şîr dixwin ew har û hov

Lê çîrok li vir naqade tu caran
Gurê har jî dê bibe nêçîra şeran



Ji axê welat difûriya

Weşanxaneya Aram pirtûka xwe ya duyemîn "Ji Axê Welat Difûriya (Vatan Toprak Kokuyordu)" pêşkêşî xwendevanan kir. Wekî tê zanîn Weşanxaneya Aram berî vê pirtükê jî bi navê "Li Mezopotamyayê Peydabûn û Kemilîna Olan" pirtûkek weşandibû. Weşanxane, di gulana 1997 hatiye damezrandin û niha amadehiya weşandina pirtûka îsmâil Beşikçi 'Hayali Kurdistan'ın Dirilişi' (Vejîna Kurdistan Xeyali) dike.

Pirtûka 'Ji Axê Welat Difûriya' jî layê Ali Yilmaz ve hatiye amadekirin. Yilmaz di pêşgotina pirtükê de li ser naveroka wê wiha nivîsandiye. "Di vê pirtükê de hûn dê kesen ku li dijî hemû dijwari û astengiyan li ber xwe didin, wêrekiya xwe ji dest nadîn û bi şewaza xwe dijmîn têk dibin, bibîmîn. Hûn dê di vê pirtükê de digel Welatneparêziyeke ketî, welatperwêrî û welatparêziyeke dilsoz û mişt evîn bibînin. Û hûnê di vê pirtükê de tevî berxwedan, fedakarî, dilsoziyê, xiyanet, xwespartin, xwefirosî û kesayetiya ketî jî bibînin."

Li aliyê din hêjayî gotin û pesnê ye ku ev pirtük, diyarî zarokên kurd Bêrivan û Dîlanê, ku di gelawêja 1996 li Edeneyê ji aliyê polisan ve habîbûn qetlkirin, bûye. Dîsa wekî her car ev pirtük jî hate berhevkin. Lî çapa yekemîn a pirtükê qediyaye. Tiştekî balkêş e ku bi tenê rûpela li ser diyariya Bêrivan û Dîlanê nehatiye qedexekirin. Wekî din, her çiqas pirtûk ji aliyê dîtbarî ve baş hatiye sazkirin jî, lê pîrbûna xeletiyen rastnivîsî berbiçav in.

Kurteçirok ji aliyê naverokê ve herîkbar in û mirov bêhtir bi rastiya gerîla û şer dihese. Serpêhatiya Ronahiyê, ku li Ewrûpa mezin bûye, bombaci Hasan û pêbawernebûna wî ya ji fer-

mandarê xwe, belavkar Saycan, Şivan Rûstem, hevaltiya Yezid Harûn û Kizilbaş Hidir, gerîlayen ku navê hev nizanin û şehîd dikevin...hwd.

Herçiqas dêrînkar(derlemeci) Ali Yilmaz nivîsên di pirtükê de wekî kurteçî-

rok bi nav dike jî, nivîs taybetmendiyen kurteçîrok û serpêhatiyê tevîhev di xwe de dihewînîn.

Li hêla din carinan awayê axaftinê hin kesan, li statuya wan a komelayeti nayê. Carinan kesekî gundi wekî zanyarekî diaxive. Her wiha wekî di çiroka

"Düşünmenin Heyamî değil (Ne heyama Ponijînê ye)" de, zarokek bi zimanê kesen mezin dipeyive. Di vê kurteçirokê de qehremanê zarok wiha dibêje: "Her çiqas ez zarok bim jî, bi qasî ku ez rewşa te ya derûnî fêm nekim, ez ne ehmeq im".

Li aliyê din, hin nivîskaran cih dane dîtinê xwe yên subjektif. Wekî mînak di kurteçiroka H.Ronahî a bi navê "Di Kelekela Gelawêjê de Şerî Dijwar ê Mirin û Jiyanê" de, nivîskar kuştina kurdekkî hevkarê dewletê bi gotinê: "Rûresîya kurdan, ronahiya çavê xiyanetê mabû termek", tîne zîmîn.

Di hin kurteçirokan de hevokên nîvî bi kurdî, nîvî bi tirkî hatine sazkirin. Di kurteçiroka bi navê 'Ji Axê Welat Difûriya' de qehremanê çirokê hevokên wekî "Bayan arkadaşlar yöneldi, Xwedê fermanim kalktı" saz kirine. Ev yek li vir geleki baş lê hatiye. Lî di çiroka bi navê "Düşünmenin Heyamî Değil" de, heman rasti baş nehatiye şayesekirin. Peyvîn, xelat û next di cih de nehatine bikaranîn.

Tevî ku di hin çirokan de iîdealizekirina kes û bûyeran heye jî, pirtûk di vî warî de bi ser ketiye. Rastiya gerîla bi aliyê xwe yên erenî û neynî hatiye zi-men.


Pewîst e berhevokeke çirokê bi kurdî jî bê weşandin. Ji ber ku kurteçirokên kurdî yên bi vî ren-gî ne kêmî yên tirkî ne. Ev yek wê rastiya, ser û Kurdistanê bêhtir bide xuyakirin.

MAZLUM DOĞAN



Rêbûwarêni lihevkinî

MEDENÎ FERHO



Lîhevkin di navbera mirovan de çedîbe. Ev xislet, xaleke bingehîn a mirovaniyê ye. Cudatiya mirovan ji lawiran hismendi û encâma civakî ye. Bêguman hismendi û encâma civakî bi têgîhgîsti şaristanî ve girêdayî ye. Bingeha van xisletan tevan perwerdehî ye. Helbet perwerdehiya nîşan!.. Li gorî lêkolîn û lêgerînê zanistî tevgera komên lawiran li ser du xalan rûniyiye. Xwedîkirin (debar) û parastin... Yanî zikdagirtin û parastin... Lawiran li hemberî xwezayê li ber xwe nedane û têkoşîn nekirine, tenê li gorî derfetên wargehan xwe guhartine. Mirov ne wiha ye.

Temerî cihanî mîlyar sal in. Mirovahî, bi qasî cihana keynar, di nav salen bi ser hevûdin de hêriştî, kevnar bûye. Serpêhatî, bûyer û kîyarên bingeh weranî, qirkirînê malkambaxî ji bo mirovaniyê bûne ezmûn. Xisleteke din ku mirovahî bi pêş xistiye û gîhandîye qonaxa û, têkoşîn û berxwedana li hemberî xwezayê ye.

Têkoşîna li hemberî xwezayê daxwaza erkê ye. Jixwe vê daxwazê, mirovanî ji her cureyê lawîren dirinde, hêrişker û dirindetir kiriye. Dirindeyî di navâ komên mirovîn cihanî de

rade rade ye. Helbet ev pêpelûka xisleta 'belakîn' di nava mirovan de jî heye. Mînaka Sezar, ku li gorî fermandarê Roma yên dema xwe tevan belakîtir bû. Yan jî li hemberî Napolion Outuzoyê rûsî... Dema em li gelên ku sûdgirtinê jindariya xwe li ser bingeha xwîn û wêfaniya gelên din danîne dinêrin, di réza yekemîn de tirk, tatar û moxol ku yek niş in têr. Tatar û moxolan hêza xwe ya dîrokî winda kirine. Lî tîrkan ev hêza xwe bi xêr û bereketa ola îslâmî heya ûro jî domandîye.


Ûro, ku mirov dêhnê xwe dide şerî gemarî ye li Kurdisatanê, tişten pir balkêş derdikevin hemberî mirov. Gele kurd 'di bin serkîsî û serdarîya Abdullah Öcalan de çend car in agirbestê daxuyan dike û bangawaziya aştiyê dike. Ev xisleten mirovaniyê ne, ku hêza delalî û dilpenahiya xwe ji dîrokî kûr û firehiya cihanî distîne. Helbet dûrmeyzînâ li ser bingeha mirovaniya şaristanî ku bi milyonan sal hatiye avakîn jî, xwe diyar dike. Ew jî hêza xwe ji xaka xwe ya dewlemed û têr bûyer û pêhatî distîne. Ev xislet tev di cest û hismendiya Abdullah Öcalan de hene. Mirovîn ku li ser xaka Kurdistanê û Mezopotamyâ digihêjin xwedî hismendiyeke dîrokî ne. Di nava serok û serdarîn berê yên gelê kurd tevan de, mirov liqasî xisleten wiha delal dike. Lî, li hemberî aşîxwaziya Abdullah Öcalan, bersiva desthilatiyâ tîrkan her tim bûye cengxwazî û xwînriji. Ev hismendi ji pêşerojîn têr xwîn û talakerî yên "Akinci"tiyê tê. Ev pazdeh sal in ku gelê kurd bi piştgiriya têkoşîna azadixwaz, daxwaza xwe ayan kiriye. Kuştin, girtin, wêranî gelê kurd çîz

nekiriye û ji daxwaza piştgiri terefgeriya azadixwazî bi paş nexistiye. Mînaka caşan nayê ber çavan, ji ber ku di her 27 serhîdanê kurdan dé heman ças û kurkurî kurtlukuiya xwe kirine. Edî ew ji civaka kurd nayen hesibandin. Ew qîrên û hawara kalen heşte salî, ew lîlefîla jînên xemle rengîn, ew tu teliyên zarakan ku ji hewayê danakevin, ew xorî û doten ku li hemberî her zor û derfetên giran artêseke gerîla damezrandine, vê yekî diyar dike. Gelo ev tişte ku ji hêla cihanî tevî ve hatiye fêmkirin, çima ji hêla desthilatiya tirk ve kû di bin bandora fermandariya artêse tîrkan de ye, nayê fêmkirin?

Ji bo rêbûwariya lihevhatin û lihevkinî pêdiviya baweriya yek xwedî, mezinbûna bi yek cure dîlok û stranê tune ye. Aşî bawerî û ramangiriyeke mirovanî ye. Aşû ne karê her mirovî ye... Mirovîn çê û xwedî xisleten ademi dikarin binbaryâ civakan bikin û barê komên xelkê li ser milen xwe bikin. Ew hismendiya ku bav û kur, bira û bîrazi, cîran û gundî, bajarı û hemwelatiyan dike ziqa hev û din çawa dîtin û bawerî ye? Ew çawa dîrok e ku bingeha jîndariya geleki li ser qirkirin, xwîn û wêraniya malkambax ya gelên derdorê dañîne?

Cengxwaziya belakî 'beroşa neh çembil a li ser tifika têr pereng û pizotên qûredaran e' ku her dem xwedîye xwe qijîlandiye.

Rêbûwariya çareserî û çareseriya pirsgirêkan pir in. Da ku mirov dîlxwazê aştiyê be. Dîrokê tu caran rê û şivileyen aştiyê negirtine û li ber mirovaniyê nebûye bend û pêşbirîn gavavînî.



Karmandan Enqere feth kerd

Erdemî va: "Wazêne ke wa tirkî u kirdî piya biratiyey rey de viyarnê, ino sebep ra wa yew gamî ra ver, inî çeteyan ra hesap persiyo.

Karmendî new-des serî yo seba heqê grev û komelatî ya peymanî sendika mûcadale kenê.

Kamik parti wexto ke muhalefet a vana: "Heqê karmandan esto, sendika heqê jîn a, ma key ke amey hikûmatî ser ma heqê jîn danê.." La belê wexto ke yenê hikûmetî ser zî inî vatisanê xo, xo vîrî kenê. Mesela Serokwezirê Tirkiya eyroyin Mesut Yılmaz wexto ke muhalefetî de bi vatê: "Eke ma mamûri ino haldo xo re îsyân nêkê, ez mîrdimaney de jîn ra şepe keno; ma key ke amey hikûmetî ser, ma ino halê memûran raşt ke. Ma him seba sendika jîn qanûna vejenê hem zî maaşandê jî rî veşî zam kenê." Eceyi zî wexto ra cêr ra cor anasar çî vatêne..

La belê beyntar a hindasî wext viyart, wîrdî piya bî hikûmat. Zamo ke da mamûra %30 ra vêşer niyo. Ana ke ino zam zaf zaf tay yew zam o. Hele yew memlekêtê ke enfâsyon (vayey) %100 bibo. Eyla enî qanûn vetê: qanûno ke kenê vejê, eke nêvejê hinî ya rind o.

Cîmkî ino qanûno ke enî vejenê o zî zaf zaf peya yew pêşnûma qanûni yo. Memûri, eyro fîili ra sendika xo gurênenê, zafin çiyo rey de; gurê hidîki kenê, grev kenê, aîdatanê azayo memûra birnenê.

Eyla ino taslaxo ke meclis de no, hikûmet bişeno, jey veje se hema hema, heme çiyan yasax keno... Ew qala rey de vanê: "Bewnî ma şima rî qanûnê sendika vet, ma hikûmet demokratî..." nêzano çi...

La belê konfîdarsayonê mamûra KESK vano: "Ma qet inî taslaxê qanûnê qebûl nêkenê, ma qet mûsade nêkenê, hikûmat keno ke inî qanûnî vetişî reyda dest û niganê ma girêdo, esas nêtê jîn ino yo. Anasar qanûn ra wo se wa nêvejê hinya rind o. Ino qanûno nêbiyaye, peya vejiya re sendikayanê mamûran yew bi yew padiyenê..."

Ew konfîdasyonê mamûra KESK ino sebep ra verê 11'dê qanûnî (raybendan) di yew di rojî... grev kerd, Tirkiya di hema hema heme çi vindert.



Serokê KESK Siyamî Erdemî va: "Eke şima him maşanê mamûra vêşî nekê, him zî inî pêşnûmayê (taslak) peya nêbancê se ma averdi hewna çalakî kenê, wa xebara şima bibo."

Eyla a aşmi ra hetana eyro hindasî çî nêbedîlya û hikûmatî zî keno ke ino taslaçî meclîs ra yew gam ra ver biviyarno, vejo...

Ew ino çend rojî ra ver sermiyananê KESK û hikûmatî ra va: "Eke şima inî pêşnûmayê nêbiyayî peya nêbancê se ma sey hezar te mamûra reydi yenê Anqere, raşteyê Kızılay zeft kenê..."

Ino bêyntar di hikûmatî ra xeber nêvejîyay û mamûrê ke giredayey KESK'î xo ino çend rojî yo hedirno û 23'ê meng de kewti tardê Anqere û 24'ê meng de miting viraş.

Hikûmatê kerd ke çend ray rare jîn birno, labelê mamûrê goş pa nêkewt ew vizer û nizda sey hezarî ten amey Anqere, miting/nûmayış (nawitiş) kerd.

Seba desteg biyâyişê mamûran Serokê HADEP Murat Bozlaç, Sekreterê CHP Adnan Keskin, Serokê ÖDP Ufuk Uras, Serokê

EMEP Levent Tüzel, Serokê DîSK Rîdvan Budak, Serokê Türk-îş Bayram Meral, Serokê TMMOB Yavuz Önen û Serokê İHD Akın Bîrdal zî weyra bî. Serokê KESK'î Siyamî Erdemî miting de vat: "Hikûmat keno ke inî neqî ke ma qezenc kerdî ayno zî ma dest ra bigiro, ma qetî qebûl nêkenê, ma hikûmatî vita ra rayna îqaz kenê, eke inî pêşnûmayê nêbiyayî peya nêbancô se, ma grew da 11'dê kanûnî ra hinya xîşin tesîr kerde grev kenê inî rojan de, wa bizanê..." Erdemî va: "Wazêne ke wa tirkî u kirdî piya biratiyey rey de viyarnê, ino sebep ra wa yew gamî ra ver, inî çeteyan ra hesap persiyo. Esas inî çetey vera nêdanê, wa ino herbî lej biqediyo..." Mamura sloganî vistî va: "Butçe herbî rî nê, mamûra/karmandan rî!"

Çeteyê meclîs de wendoxê hepîs de! Şîma nişte vengê KESK'î birnê! Ü miting bêbûyerin vila bi.

Ma veynê hikûmat û marmûrî inkay ra pey se kenê!

C. ZERDÜŞT

WELAT

Rojnameya Hefteyi
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayincılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedi (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX:
(0 212) 251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMÎ TAN

Berpîsê Karêن Nivîsaran
(Yaz İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîsê têkiliyên bi gel re
(Halkla ilişkiler müdürü)
REFİK İNCİR

Berpîsê Sazîye
(Müessese Müdürü)
TAHIR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.
BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:
(Nûnerî Giştî yê
Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
49 871 67 08 15

Brûksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jana Seyda
Helim Yûsiv

Berlin:
Silêman Sido
00 49 30 691 6495

Hannover:
Selîm Biçûk
49 572 18 13 60

Stockholm:
Robin Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda:
S. A. Fewzi
31 104 85 55 43

ÜLKEDÊ

Ji Gündemê

Ji editora U.Gündemê

ROJ BI BÊJINGÊ NAYÊ VEŞARTIN

Her çiqas rojnameyên ku divê bibin bîra dîro-kê, xwe bidin alî ji, em her dem li gorî dab û nîrîtên rojnamegeriyê meşyan û dimeşin. Ji ber vê yekê em bi awayekî objektif cih didin bûyer û diyardeyan. Û em tiştên ku bi zanebûn serê wan tê girtin, pêşkêşî mirovan dikin. Lewre gava em li raboriya xwe temaşe dikin, em dibînin me heman wêne gelek caran weşandine û me bi berdêlên mezin rastî anîye zimên. Medyaya birjuwazî, ku "Kонсept 1993'yan" di ser guhê xwe re avêtibû, iro şâş û metelbûna xwe ya derewîn tîne zimên.

Gava ku me cih da şerê qirêjî yê ku li bajarên kurdan bi metodên taybet tê meşandin, kontrgerilayêñ ku rayeya infazkirinê ji wan re hatiye dayîn û JITEM ê; gava ku me cih da saziyên dewletê yêñ ku wekî rôxistinêñ îstîxbaratê dixebitin, OHAL'a ku gundan dişewitîne, vala dike û li meydanêñ gundan dezgehêñ îşkenceyê saz dike û gava me qala polis û itîrafkar û cerdevanan kir, em bi cudakarî û binpêkirina qanûnan hatin tawanbarkirin û rojnameya me hate berhevkirin. Her wiha ev demeke ku nahêlin ku rojnameya me bigihêje herêma OHAL'ê. Dema pîrsa "çete çi yê" tê kirin, rayedarêñ dewletê jî dibêjin, rôxistineke tawankar e û di nav de polis, bürokrat, fermandarêñ leşkerî û cerdevan û itîrafkar hene. Her wiha diyar dikin ku wan kesan gelek cînayetîn "Faîli mechûl" pêk anîne. Li xwe mikur têñ û didin zanîn ku, hin kesen ku termêñ wan li bin piran hatine dîtin, ji dadgehan hatine revandin û hatine kuştin.

Nîha yêñ ku manşetên wekî "Way Way (Sahabî)", Sosret e (Hürriyet) diavêjin, diyar e, aligiriya veşartina rastiyân dikin û digel vê yekê jî naxwazin lêpirsina rapora Susurlukê bikin. Ji ber ku, ev derûdar bi fermana MGK'ê radibin û rûdinin. Yêñ ku li pey qezaya Susurlukê yekser cih dane dosyaya Abdullah Çatlı, iro çîma li ser cînayetîn failî meçhûl yêñ ku Serokwezir Yilmaz behs dike, lêkolînê nakin? Her çiqas ev agahî li ber destê wan hebûn jî, tiştekî bi vî rengî nekîn.

Partiyêñ desthilatdar û dîjber dibêjin, bêguman JITEM heye. Bi rastî jî év yek gelekî ronî û zelal e. Her wiha her kes dide xuyakirin ku, cînayetîn li herêmê %95 bi destê endamên JITEM ê pêk hatine. Lî medyaya birjuwazî, bürokrat û rayedarêñ dewletê vê yekê naynîn zimên. Serokwezir Mesut Yilmaz ji medyayeke bi vî rengî piştgiriye dixwaze û daxwaza piştgiriya gel jî dike. Heke di vî warî de ji dil be, bila politikayeke vekirf bimeşîne. Ji ber ku raz (sîr) û bend li ber rastiyân têk diçin. Medyaya birjuwazî jî bila dev ji berdevkiya şer berde. Ji bo ku neheyire jî, bila berê xwe bide bajarêñ kurdan û guhêñ xwe jî ji bo biratiya kurd û tirkân bel bike. Roj bi bêjingê nayê veşartin. Ji bo ku tîrêjîn rojê hemû cihanê ronî bikin, emê hewl bidin xwe.

Rêlibergirtin û zordariyên li ser Rojnameya Ülkede
Gündemê dom dikin



24 rîbendan 1998 Şemî:

MEHMET ÖZDEMİR LI JITEM'Ê YE

Endamê HADEP'ê Mehmet Özdemir ku di 24'ê berfanbara 1997'an de ji hêla polisên sivil ve hatibû binçavkirin û ji wê rojê ve tu agahî der bârê wî de nehatibûn dayîn; diyar bû ku li JITEM'ê di bin îşkenceyên gîran de ye. Kesekî bi navê R.Y. ragihand ku wî Mehmet Özdemirê ku wî ew ji HADEP'a Amedê nas kiriye, di dema ku ew bi xwe jî di binçav de bûye li koridorêñ JITEM'ê ditiye. R.Y. dibêje ku, Özdemir di rewşeye wisa ku nikaribûye li ser lingên xwe bisekine dîtiye. Li ser vê yekê Komîsyona Şaxa li Dijî Windahiyan ya İHD'ya Stenbolê, bi daxuyaniyeke çapemeniyê diyar kir ku ew dixwazin rewşa Mehmet Özdemir sayî bibe. Her wiha komîsyon, gotina serokwezîr Mesut Yilmaz a bi rengê, "Di dema min de qet cînayetîn faîli meçhûl pêk nehatine" jî şermezar kir.

25 rîbendan 1998 Yekşem:

CARESERÎ DITIRSÎNE

Serokê Gîştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan rapora Susurlukê ku demekê berê ji hêla Serokwezirê Tirkîyeyê Mesut Yilmaz hatibû eşkerekirin, nirxandinek kir. Öcalan çete wekî organîzasyoneke cidî bi nav kir û got ku, ji bo fêhmkirina çeteyê pêwîst e mirov der heqê qetliamên Mereş û Çorumê de xwedî agahiyêñ têrtijî be. Abdullah Öcalan di nirxandinê de wiha got: "Divê lêkolîneke berfireh der barê sê hezar cînayetîn failî meçhûl de bê kirin. Ji bo van kuştinan kê ferman daye, karsazên kurd kê dane kuştin? Divê ev pîrs bêne bersivandin." Her wiha Öcalan got ku alozî û tevliheviyê li Tirkîyeyê herî zêde ji hêla artêşê ve tê fêhmkirin, lê di warê gavavêtinê de artêş ditirse, sedema vê yekê jî Öcalan wiha bi lêv dike: "Heger artêş ji bo çareserîye gavan biavêje, wê derdorêñ ku bi şer xwe finanse dikin, wê bi gotina "Tirkîye ji dest di-

ce" qiyametê rakin.

26 rîbendan 1998 Duşem:

DOZA AYDIN Û AY DIÇE AİHM'YÊ

Pıştı itîrafa Mesut Yilmaz ku gotibû "Cendekên kesen ku ji dadgehan hatibû birin, li bin piran hatin dîtin".... Malbatê Dr. Necati Aydin û Mehmet Ay û parêzerên wan hewl didin xwe ku der heqê mijarê de serî li Dadgeha Mafêñ Mirovan a Ewrûpayê (AİHM) bidin. Cigîrê Serokê Komeleya Mafêñ Mirovan Av. Osman Baydemir ragihand ku wan berê serîlêdana şexsî li AİHK'ê kiribûn û komisyonê jî bûyera kuştina Dr. Necati Aydin şayanî lêkolînê ditibû û hewelayî AİHM'ê kiribû. Her wiha Baydemir ragihand ku, di fail-i mechûlê ku li Kurdistanê diqewimin de tiliya çeteyê ku di nav dewletê de ne, heye. Wekî tê zanîn Serokê Tüm-Sağlık-Sen'a Elezizê Dr. Necati Aydin di sala 1994'an de hatibû binçavkirin û pişt re jî cendekê wî li nêzîkî Madenê di bin pirekê de hatibû dîtin.

27 rîbendan 1998 sêşem:

GIRTÎ LI BENDA TEDAWIYÊ NE

Girtiyêñ ku li girtîgehêñ Erzeromê 55 rojan di grevên birçibûnê de mabûn û pişt re jî bi pejirandina daxwazan dawî li grevên xwe anîbûn, tedawiya wan nayê kirin. Serokê TUHAD-DER'ê Halis Doğan roja 26'ê rîbendanê der heqê vê mijarê de li Komeleya Mafêñ Mirovan (İHD) daxuyaniyeke çapameniyê. Doğan di daxuyaniyeke de ragihand ku, pişti grevên birçibûnê di gelek girtîgehan de nexwesiyêñ gîran dest pê kirine. Her wiha Halis Doğan got ku Yekîtiya Tabîbêñ Tirk (TTB) dixwaze müdaxaleyê vê yekê bike û girtîyan tedawî bike, lê wezareta tendûristiyê rê nade vê yekê. Doğan diyar kir ku ji encamên xirab û mirinan dê ew dewlet berpirs bibinîn.